# Çareserî destê Ocalanî de ya




**PARLAMENTERÊ** HDPyî yê Anqara û Verfekê Heyetê Îmrali Sirri Sureyya Onderî derheqê proseso ke Tirkîya ti ra vîyarena de vînayîşê xo ard ziwan. Onderî bale ant vatişanê Ocalanî û wina va: "Heme vatişê ke Birêz Ocalanî wextê pêvînayîşan de vatbî, raşt vejîyaye û heme qewimîyayîşê herême zî goreyê vatişê ci vejîyayî."

**ONDERÎ** va 'peyman û polîtîkayê şerî ke Tirkîya tercîh kerdo, vernîya cuyayîşî de astengîyêka gird awan kerdo' û wina domna: "Bedelê nînan xeylê giran bî. Ma hêvî kenî ke nika Tirkîya polîtîkayê ke kurdan rê dişmen î û vera statuya kurdan de asteng benî ra fek verabido. Reçeteya çareserî destê Ocalanî de ya." ... RÛPEL - 11

ROJEVA
# Medya
2 Çile Duşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 53

## Sala nû sala fînalê ye

Berdevka YPJ'ê Nesrîn Ebdullah diyar kir ku sala 2016'an ji bo YPJ'ê sala rengdanê bûye û wiha got: "YPJ'ê di di sala 2016'an de ji gelek serkeftinên mezin re pêşengî kir, dê di sala nû de bigihîje fînalê." Ebdullah bang li jinan kir ku bi hêza xwe xwe xurt bikin... RÛPEL-2





## Cezayê muebetê tê xwestin

Hemû mafên gelê kurd ên demokratîk ji hêla dewleta tirk ve wek sûcên mezin tên dîtin. Hevşaredarên Erdîşê Dîba Keskîn û Abdurrahman Çagan jî di nav de, 38 HDP'î û DBP'î tên darizandin, dozger der barê 38 siyasetmedarên kurd de bi hincetên vala cezayê muebbetê xwest... RÛPEL - 6



## Bi hovîtiya qeyûm re rû bi rû ne

Welatiyên êzidî yên ji ber hovîtiya çeteyên DAIŞ'ê ji Şengalê revîn û li Kampa Yenîşehîrê di serdema DBP'ê de hatin bicihkirin, niha bi hovîtiya qeyûmê AKP'ê re rû bi rû ne. Qeyûmê li Şaredariya Yenîşehîrê hat bicihkirin êzidî ji kampê derxistin û wan dişîne wargeha AFAD'ê ya Midyadê... RÛPEL - 6



## 146 rojnameger girtî ne

Sala 2016'an bi zext û zordariyên dewleta AKP'ê ya li ser rojnamegeran derket pêş. Berdevkê Înîsiyatîfa Rojnamegerên Azad Hakki Boltan diyar kir ku li gorî salên borî êrîşên li dijî çapemeniya azad zêde." Li gorî raporê 146 rojnameger li Tirkiyeyê di girtîgehê de ne... RÛPEL - 6

**Bi rojane Diyanet, mela û çapemeniya AKP'ê li dijî pîrozbahiyên sersalê fetwa didan. Li Stenbolê li hemberî kesên ku sersal pîroz dikirin êrîş pêk hat û 39 kes hatin kuştin**

# Bi qetlîamên nû salê dest pê kir

**FETWAYÊN QETLÎAMÊ DIDAN**



DI SERÎ DE TIRKIYE, hemû cîhan bi êrîşa li Stenbolê hejiya. Berî êrîşê di serî de Diyanet û gelek kesên wekî Cubbelî Ahmet Hoca û rojnameya Mîllî Gazete fetwaya qetliamê dabû û antîpropagandaya sersalê kiribû. Her çendî xwediyê Reinayê got ku 'Amerîkayê em hişyar kiribûn' jî tu bergirî ji bo vê êrîşa hovane nehatin girtin û 39 kes hatin qetilkirin... RÛPEL - 3

**ARTÊŞA TIRK LI BABÊ 17 SIVÎL QETIL KIRIN**



DEWLETA TIRK A ku axa Sûriyeyê dagir kiriye, her roj komkujiyekê pêk tîne. Li gorî agahiyan balafirên artêşa tirk li nêzî bajaroka Tadef a girêdayî Babê, dîsa sîvîl kirin hedef û di êrîşa balafirên artêşa tirk de 17 sivîl hatin qetilkirin û 155 kes jî birîndar bûn. Hat gotin ku di êrîşa artêşa tirk de leşkerê tirk ê bi navê Ayhan Guzel jî jiyana xwe ji dest daye... RÛPEL - 5

SEROKÊ MECLISA AVAKAR A ŞENGALÊ

## Tekane rê xweserî ye

Gelê êzidî ku di 73 fermanan re derbas bûye, bi pêşengiya Tevgera Azadiyê xwe bi rêxistin dike. Lê gelek rayedarên PDK'ê ji vê yekê ne razî ne. Serokê Meclisa Avakar a Şengalê Xidir Salih da zanîn ku ji bo pêşîlêgirtina fermaneke din tekane rê îlankirina xweseriya Şengalê ye û wiha got: "Dê gelê êzidî xwe bi xwe qedera xwe diyar bike." ... RÛPEL - 8






## Hemleya azadiyê pişta DAIŞ'ê şikand

Hêzên HSD'ê yên ji bo hebûna çeteyên DAIŞ'ê ya li Reqqayê bi dawî bikin berî 22 rojan hemleya Xezeba Firatê da destpêkirin, heta niha 110 gund, bi dehan gundik, gelek girên stratejîk rizgar kirin. Di pevçûnên ku li wan herêman rûdan de, 277 çeteyên DAIŞ'ê hatin kuştin û 13 çete jî hatin girtin... RÛPEL - 5

## Artêşa tirk êrîşî Rojava dike

Artêşa tirk êrîşên xwe yên li dijî Rojava didomîne. Herî dawî gundên Minbicê û Kobanê bûn hedefa topên dewleta tirk. YPG'ê got ku gundên Girbenav, Koran, Carikli û Qeremox ên dikevin rojhilatê Kobanê, ji hêla artêşê ve hatine bombebarankirin... RÛPEL - 5



Yekitiya Ereban: Dê aştî xirab bibe → R4

'Diwahemîn Henarî Dunya' → R9

www.arsivakurdi.org

## Jiyana li gundan li bajaran tune ye

**SEBAHAT YALÇIN** a 48 salî da zanîn ku 9 sal berê koçî taxa Yenî Bosna a Stenbolê kiriye û diyar kir ku wan tu carî dest ji kevneşopiyên xwe bernedaye û got ku di her şert û mercî de wan têkoşîn meşandiye. Yalçin da zanîn ku samîmiyeta li gund li vir tune ye û wiha got "Em mehkumî van betonan bûne. Em li gundê xwe pir bextewar bûn. Ev der ji bo me teng in. Jiyana min li vê şaneşînê derbas dibe. Em neçarî vê jiyanê kirin." Yalçin anî ziman ku li gund baxçeyên wan hebûne û jin li baxçeyan dihatin gel hev û wiha axivî: "Em li baxçe dihatin cem hev. Me destê xwe dida hev. Em li gund gelek bextewar bûn. Ji ber şerê li Kurdistanê me koç kir. Cihekî em biçinê tune bû." Yalçin got ku di ew di van şert û mercên zehmet de hewl didin xwarinên xwe yên herêmî çêkin. **STENBOL - ŞÛJIN**



## Jin cihekî sereke di federaliyê de DIGIRIN





Pergala Federaliya Demokratîk a Rojava-Bakurê Sûriyeyê di 16'ê adara 2016'an de hat îlankirin û piştî ku Meclisa Damezirîner a Federaliyê civîna xwe ya 2'yemîn di 28'ê kanûna 2016'an de pêk anî, gelek biryarên girîng dan. Di civînê de navê pergalê hat guhertin û bû Pergala Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê. Têkildarî rola jinan a di nava pergala federaliyê de endamên Meclisa Damezirîner a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê nirxandin kirin.

Endama Komîteya Hevpeymana Civakî ya Meclisa Damezirîner a Pergala Federasyona Demokratîk a Bakurê Sûriyê Derya Remezan destnîşan kir ku serkeftinên li Rojava di encama têkoşîn û pêşengiya jinan de hatine bidestxistin û wiha got: "Serkeftina ku bi pêşengiya jinan hatiye bidestxistin ji tevahiya cîhanê re bûye mînak. Jinan di warê leşkerî, siyasî û rêxistinî de li tevahiya cîhanê deng vedaye. Îro jin bi hemû hêza xwe li hemberî çeteyan di çeperên şer de têkoşînm dimeşînin." Derya Remezan got ku jinên kurd di aliyê siyasî de roleke girîng lîstiye di pergala Federaliya Bakurê Sûriyeyê de û ji sedî 50'yî zêdetir jin cihê xwe di nava Meclisa Damezirîner de digirin. Derya Remezan destnîşan kir ku jinan di nav Hevpeymana Civakî û tevahiya saziyan de jî birêxistinbûna xwe ava kiriye û feraseta yekdewlet û yeknetew tune ye.

**PROJEYA SERKEFTÎ**

Endama Komîteya Xebatên Civakî ya Pergala Federaliyê Hêvîn Hisên jî diyar kir ku wek ku Şoreşa Rojava bi şoreşa jinan û bi serkeftinên mezin hat nasîn, di heman demê de careke din ev şoreş di nava federaliyê de dubare dibe û ev tişt anî ziman: "Civînên ku pêk hatine bêhtirî xwe jin tê de cih digirin. Jinan bi beşdarbûna xwe ya nav civakê de roleke mezin lîst û derdora xwe îqna dike. Ji ber ku jin bi rêya perwerdeyê gihaştine asteke zanebûnê û di hemû xebatan de bi ser dikevin û dê projeya me bi ser bikeve." **RIMELAN - ŞÛJIN**

# Pêşengiya YPJ'ê dê berdewam bike

**Berdevka YPJ'ê Nesrîn Ebdullah têkildarî sala nû axivî û got ku sala 2016'an ji bo YPJ'ê sala rengdanê bû û wiha got: "YPJ'ê di aliyê siyasî û leşkerî de di sala 2016'an de pêşengî kir, dê sala nû ev bigihîje fînalê."**

BÊRÎTAN SARYA / QAMIŞLO - ANF

Berdevka YPJ'ê Nesrîn Ebdullah têkildarî têkoşîna 2016'an a YPJ'ê de axivî. Nesrîn Ebdullah diyar kir ku sala 2016'an bû saleke cuda û sala 2016'an ew wek YPJ tev li hemleyên Xezeba Xabûrê, hemleyên Elîn û Cûdî, Minbic û Reqqayê bûn û wiha got: "Hemleya Reqqayê hê jî didome. Ji bilî van jî, di hemleyên Eşrefiyê, herêma Fabrîqe, Sekene, Şiqeyf de YPJ'ê cihê xwe girt. Dîsa, li milê Efrînê wek YPJ xebatên xwe domand. Li Şehbayê di bin sîwana Ceyş El Suwar de YPJ'ê jî wek tabûreke jinan cihê xwe girt. Li Cizîr û Kobanê jî YPJ'ê roleke girîng lîst. Yanî YPJ'ê pêşengiyeke girîng kir. Piştî YPJ beşdarî hemleyan bû xweseriyek jî derkeft holê û YPJ'ê bandoreke mezin li ser hêzên QSD'ê kir. Ji ber ku YPJ yekem hêza xweser a di nava QSD'ê de bû."



Nesrîn Ebdullah anî ziman ku sala 2016'an ji bo YPJ'ê bû sala rengdanê, ji aliyê civakî, siyasî û leşkerî de û wiha axivî: "Dîsa hat dîtin ku têkoşîn û şerê YPJ'ê ne tenê ji bo parastina axê, di heman demê de ji bo sazkirina kesayeteke nû ye jî." Nesrîn Ehmed destnîşan kir ku ew wek YPJ îro ji bo hemû jinên cîhanê bûne îlham, ji ber ku heta niha nebûye dûbareya tu hêzan û ne jî bûye artêşa klasîk û got ku ew bi felsefeya xwe ya jinan û şer pêşengiyê dikin. Berdevka YPJ'ê Nesrîn Ebdullah destnîşan kir ku wekî YPJ'ê di aliyê dîplomatîk de jî xebatên girîng di sala 2016'an de li qada navneteweyî dane meşandin, loma ruhekî enternasyonal bi pêş ket. Nesrîn Ehmed bal kişand ser perwerdeya YPJ'ê jî diyar kir ku perwerdehiya pisporî hatiye bipêşxistin, akademî hatine vekirin û di van de perwerde hatine dayîn.

**PÊNGAVA REQQAYÊ**

Nesrîn Ebdullah bal kişand ser pêngava rizgarkirina Reqqayê û ev tişt anî ziman: "Wek min îfade kir, em di heman demê de şerekî îdeolojîk dimeşînin. Rizgarkirina Reqqayê ne tenê rizgarkirina bajarekî ye. Rizgarkirina Reqqayê di heman demê de rizgarkirina fikran e. Ji ber ku em wek jinên YPJ'î li her deverên ku YPJ tê dikoşe, ne tenê rizgarkirina ji DAIŞ'ê, hedefa me di warê zihnî û fikrî de nûbûn û azadkirin e. Dîsa, divê çanda demokratîk û jiyana xwişktî û biratiyê kûr bibe. Em di heman demê de ji bo rizgarkirina jin û mêran tê dikoşin û şer dikin. Ger wisa nebe, dê dîsa sîstema zilamserwer û dûvikên wê bi ser bikevin. Li ser vî esasî hemleya Xezeba Firatê ya ji bo rizgarkirina Reqqayê dest pê kir, esas hemleya azadkirina civakê ye. Di sala 2017'an jî em ê bi heman tempo û coşê tev li vê pêngavê bibin, Reqqayê rizgar bikin û tola tevahiay jinan hilînin."



## Armanc parastina neteweya demokratîk e

**BERDEVKA YPJ'Ê** Nesrîn Ebdullah bal kişand ser sala nû û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Sala 2017'an dê di warê leşkerî û siyasî de bibe sala fînalê. Ger çareserî bi pêş nekeve jî dê derfetên çareseriyê bi pêş bikevin. Lê ji milekî ve jî îhtîmal heye ku nakokî û şer hê kûrtir bibin. Lê, wek YPJ em ê her tim ji bo çareseriyeke aştiyane û demokratîk piştgiriya xwe bînin ziman. Dîsa, ji bo em karibin çareseriyê bi pêş bixin divê em hêzên xwe mezin bikin. Em hedef dikin ku hêza xwe 2-3 qatan mezintir bikin. Ev ruh, di YPJ'ê de bûye ruhê parastina neteweya demokratîk. Dîsa, li ser vî esasî em dixwazin bi perwerdeyan vê hêzê bigihînin asta pisportiyê. Li milê din, bi taybet wek jin ji bo me esas ew e ku em kesayeta xwe bi cewherî ava bikin. Ne tenê di milê leşkerî, li ser esasê paradîgmaya civaka demokratîk, ekolojîk, azadîxwaziya jinan hêzên xwe hê kûrtir bikin. Em xwedî vê hêzê ne. Em dizanin ku jinek azad û têgihiştî, civakeke azad û têgihiştî ye. Ev hedefa me ya stratejîk e. Dîsa em ê tempoya xwe ya ji bo Hemleya Xezeba Firatê ya ji bo rizgarkirina Reqqayê dest pê kir, bidomînin û bi rizgarkirina Reqqayê tevahiya jinan azad bikin.

## 'Em ê tola jinên Şengalê hilînin'

Bi pêşengiya şervanên YPJ'ê têkoşîneke bêhempa li hemberî çeteyên DAIŞ'ê tê dayîn. Têkildarî rola jinan di hemleya 'Xezaba Firatê' de Berdevka Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê Cîhan Şêx Ehmed axivî. Cîhan Şêx destnîşan kir ku armanca pêngavê rizgarkirina jinan e û wiha got: "Tevahiya cîhanê dizane ku çeteyên DAIŞ'ê û alîgirên wan dijiminê jinan û tevahiya mirovahiyê ye. Pêngava 'Xezeba Firatê' pêngaveke stratejîk e û serkeftina vê pêngavê derbeyeke mezin li dijî çeteyan e. Em ê bi berxwedana xwe DAIŞ'ê têk bibin. Bi rizgarkirina Reqqayê re em ê tola tevahiya jinan û bi taybet jî ya jinên Şengalê ku li bazaran hatin firotin, hilînin." Cîhan Şêx bal kişand ser girîngiya rizgarkirina Reqqayê û wiha axivî "Malbata min û gelek malbatên wek wan ku li Reqqayê dijiyan, rastî îşkence û zehmetiyên mezin hatin. Em ê jî heya dawiyê tê bikoşin da ku em wan rizgar bikin. Ev gav ji tevahiya cîhanê re dê bibe mînak. Xeyala min ew e ku cihê zarokatiya anku Reqqayê rizgar bikin." Cîhan Şêx destnîşan kir ku ew beşdarî gelek pêngavên rizgarkirinê bûye lê got ku rizgarkirina Reqqayê ji bo wê pir cuda ye. ***REQQA - ŞÛJIN***



## 'Kolan qad û barîkat ên me ciwanan in'

Yekitiya Xwendekarên Lîseyê ya Amedê (LOB) ku bertek nîşanî komkujî, binpêkirin û zextan da, bang kir ku li dijî faşîzmê bibin yek. Jinên LOB'ê daxuyaniyek nivîskî da û wiha got: "Bi OHAL û KHK'yan re em bi lez û bez hedef hatin girtin. Komele û weqfên me hatin girtin. Qezencên me jinan hatin xespkirin û komeleyên jinan bi taybet hedef hatin nîşandan û girtin. Hevserokên me bûn hedef. Hemû mamosteyên me yên demokrat ji kar hatin avêtin û îxrac kirin. Li girtîgehan polîs-îdareyê hemû mafên xwendekaran xesp kirin. Li dibistanan hewl tê dayîn pergala şerîatê bê afirandin. Gotinên ku jinan wek metaya zayendê dibînin hene û bi pratîka vê jî nîşan didin. Her mamosteyek wek endamekê/î MÎT'ê dixebite. Hewl didin hemû dibistanan veguherînin îmam hatîban."

Di daxuyaniyê de hat destnîşankirin ku ew bi taybet xwendekarên lîseyê di eniya ciwanan de 'berxwedan jiyan e' diqîrin û wiha hat berdewam kirin: "Bila gelê me bi me bawer be û em tu car nakevin bêhêvitiyê. Me çawa li Geziyê, Nisêbînê, Sûrê, Colemêrg, Geverê li pişt barîkatan xwe ji gelê xwe re kir mertal, em çawa di her çalakî û meşê de di eniya herî pêş de bûn, em ê îro jî di qadên herî pêş de bin. Me soz da ku em ê xeyalên 33 rêwiyên azadiyê pêk bînin. Em ji bo hemû jinên ku hatine qetilkirin, girtin û rastî îşkenceyê hatine, têkoşînê mezin dikin. Dibistan, qad, kolan û barîkat ên me ciwanan in. Em ê tê bikoşin, azad bibin û azad bikin." ***AMED - ŞÛJIN***

# Beriya sersalê gef hatin xwarin!

**Li Tirkiyeya ku bi mirina 39 kesan re ket sala nû, çend roj beriya êrîşê li bajarên cuda li dijî pîrozbahiyên Noelê afîş hatibûn daliqadin. Her wiha Diyanet jî bi daxuyaniyekî gotibû ku divê tu bawermend sersalê pîroz nekin**



Tirkiye piştî kampanyayên li dijî serê salê bi mirina 39 kesan kete sala nû. Li Ortakoyê ya Stenbolê li dijî kuluba Reinayê di êrîşa çekdarî de yek jê polîs 39 kesan jiyana xwe ji dest da, 69 kes birîndar bûn.

Beriya çend rojan a sersalê li bajarên cuda bi afîşên hatin daliqandin û belavokên hatin belavkirin, pîrozbahiyên sersalê hedef hatibûn nîşandan.

Di afîşekê de ku hatibû daliqandin, zilamekî bêsimbêl û birih, kulm avêtiye kesekî ku cilên Kalo Gaxan li xwe kirine û li ser wêneyê jî nivîsa "Em misilman in, ji pîrozbahiyên sersalê û Noelê re na" hatibû nivîsandin. Li qada Konakê ya Îzmîrê jî welatiyan mudaxaleyî kesekî ku belavok belav dikirin, kir.

### KESÊN BICUBE

Li Qada Konakê di navbera kesên bicube ku gotina "Em cejna xiristiyanan pîroz nakin" û welatiyan de nîqaş derket. Li ser belavokên ku li ser navê Weqfa Silayê hat belavkirin û nivîsa "Em cejna xiristiyanên ku cîhan kiriye gola xwînê, pîroz nakin" û welatiyan jî bi gotina "di vê belavokê de nefret heye, hûn nikarin belav bikin" nerazîbûn nîşan dan.

### LI WANÊ JÎ AFÎŞ

Li Wanê jî li cade û kolanan afîşa "Ji sersalê re na" hate daliqandin. Di afîşan de ku welatî matmayî kirin, wiha hatibû nivîsandin: "Ey ûmeta Mihemed çima hûn sersala xiristiyanan pîroz dikin. Heke tu li gorî piraniya mirovên li cihanê tev bigerî Xwedê dê te ji rê derxe. Ji sersalê re na, ji ber ku em misilman in."

### FETWAYA DIYANETÊ

Serokatiya Karên Diyanetê beriya êrîşa sersalê daxuyaniya "Nezîkatiyên ku tiştekî ji bo jiyana mirovan nade û ne li gorî nirxên me me li bawermendan nayê" dabû.

Piştî êrîşa li dijî Reianayê balkêş e ku demildest ji Diyanetê daxuyanî hat. Serokê Serokatiya Karên Diyanetê Mehmet Gormez di hesabê xwe yê Tiwetterê de ev daxuyanî parve kir: "Tu ferqa vê qetlîmê ji ya li dijî bazarekê, perestgehekê hatiye kirin, nîn e. Tekane armanc li gorî terzê jiyanê civak parçekirin û anîna li hemberî hev e."

*STENBOL - DÎHABER*





## Karayilan: Em êrîşê şermezar dikin

**ENDAMÊ** Komîteya Rêveber a PKK ê Murat Karayilan ji Dengê Radyoya Kurdistanê re axivî û têkildarî êrîşa li Stenbolê agahiyên pir girîng dan. Karayilan êrîş şermezar kir û ji malbatên ku xizmên xwe winda kirin re sersaxî û ji birîndaran re jî şifaya xêrê xwest. Karayilan aşkera kir ku tu têkiliya hêzên kurd û kurdistanî bi êrîşa ku qewimî re nîn e û wiha got: "Di şevê de yên ku bûne hedef piranî yên biyanî ne. Ev planek e. Ev çalakiyeke wisa ye ku destê hinek kesan tê de heye. Ev ji bo werin hawara Tirkiyeyê, wekî Erdogan-AKP ji bo ku ji vê tenêbûnê xilas bibe, hatiye amadekirin. Ev tiştekî aşkera ye. Ew rondikên ku ji çavên wan dibarin û xemginiya ku didin nîşandan, wekî rondikên tîmsahan in. Erdogan û AKP zalim in. Ew ji bo berjewendiyên xwe, ji bo deshilata xwe, xwîna xelkê diherikînin." BEHDÎNAN - ANF

## Millî Gazete: Ev hişyariya dawî ye




**MÎLLÎ GAZETE** çend roj beriya sersalê, kampanyaya "Pîroz neke!" dabû destpêkirin. Ev kampanya destpêkê di 26'ê kanûnê de bi derxistina manşetê dest pê kir. Rojnameyê îdia kir ku wan pêşengiya "kampanyaya dildarî" kiriye. Her wiha di manşetê de îfadeyên "bombeya sersalê ku di maneviyeta me de hatiye bicihkirin, em biteqînin" hatibû bikaranîn. Mîllî Gazete di 31'ê kanûnê de bi manşeta "Ev hîşyariya dawî ye, sersalê pîroz nekin" derketibû. AMED




## HDP: Heke berpirsyarî nebe dê kaos mezintir bibe

**LIJNEYA** Rêveber a Navendî ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) têkildarî êrîşa li dijî Navenda Şahiyê ya Reina ya Stenbolê pêk hat û 39 kesan jiyana xwe ji dest da û 65 kes birîndar bûn daxuyanî da. HDP'ê di daxuyaniya nivîskî de diyar kir ku ew vê êrîşê bi tundî şermezar dikin û wiha got: "Ji kesên jiyana xwe ji dest daye rahmetê û ji malbata wan re sersaxiyê dixwazin. Ji birîndaran re jî şîfayê dixwazin. Hebûna siyasetmedarên ku bê berpirsyarî axaftinan dikin, ne di ferqa dewlemendiya nasnameyên rengîn ên Tirkiyeyê de ne. Ev nêzîkatiyên siyasî gav bi gav Tirkiyeyê ber bi kaosê ve dibin. Em vê êşa giran parve dikin û careke din dibêjin; heta polîtîkayên hundir û derve yên rê li pêş enî û çeperan vedikin û dijminantiyê bi pêş dixin, li ziman û feraseta xwe ya tundiyê pêş dixin ne baldar nebin, dê ev kaos mezin bibe. Kesên ku gavên erênî neavêjin û bi arkolkê diçin ser agir berpirsyarên siyasî ne. Em ji hemû civakê re sersaxiyê dixwazin." ENQERE - DÎHABER




## 'Li Kurkçulerê dibe ku provakasyon derkeve'

Endamê DHF'ê Dîren Taşkiran ê 6 meh li Girtîgeha Tîpa F a Kurkçulerê girtî ma û paşê hat tehliyekirin, der barê binpêkirinên mafan ên li girtîgehê de agahî dan. Taşkiran anî ziman ku bi OHAL'a piştî hewldana darbeyê hat îlankirin re, li girtîgehan pêkanînên cidî xistine dewrê û got ku bi OHAL'ê re binpêkirinên mafan zêde bûne.

Taşkiran anî ziman ku li girtîgehê li koguşa 3 kesî 6 kes dimînin û ji ber ranza kêm in, girtî li erdê radizên. Taşkiran diyar kir ku li girtîgehê bi awayekî kêfî lêgerîna koguşan tê kirin û got ku girtiyên li dijî lêgerînê dertên jî bi awayekî derbkirî wan dibin odeya bisînger û wiha domand: "Bi awayekî kêfî lêgerîn dikirin û dest datanîn ser amûrên me. Dem me îtiraz dikir jî digotin, 'em dewlet in, tu mafekî we tune ye. Em çi bêjin, divê hûn wê bikin.' Ji ber em li dijî lêgerîna kêfî derketin, em hatin derbkirin. Dema me dibirin odeya bisînger, ji bo em dirûşmeya berz nekin devê me û pêzê me girtin. Min nikaribû bêhnê bistîne. Heta hindik mabû bimirim. Ji ber min nikaribû bêhnê wergire, rastî îşkenceyek fetisandinî hatim. Min ev gilî kir."

Taşkiran anî ziman ku li girtîgehê bi sepandina "Tevlihev bike, li hev bîne", girtiyên siaysî, yên FETO'yî û yên din li heman blok û korîdorê bi cih dikin û got ku îdareya girtîgehê ji bo li girtîgehê polîtîkayeke rageşiyî zêde bike vê sepandinê didomîne. EDENE - DÎHABER



## Ji ber şewba harê herêma Licê xistin dorpêçê

Li mezraya Kancerê ya Gundê Bawerdê yê navçeya Licê ya Amedê hat zanîn ku şewba harê belav dibe. Welatiyên herêmê diyar kir ku sewalên biyanî ev şewba harê bi xwe re aniye û li gund belav bûye. Ji ber şewba harê gelek sewalên mezin mirar bûn. Welatiyên herêmê piştî agahî dan beytaran, beytar û yekîneyên Midûriyeta Sewalkarî û Zexîreyan a Bajar li herêmê lêkolîn kirin. Beytarên Zanîngeha Firatê ku li herêmê lêkolîn kirin, teşhîsa harbûna sewalan kir. Li ser vê nexweşiya harê rayedarên tenduristiyê li herêmê dest bi zeryinên harê kirin.

Piştî vê nexweşiya şewba harê dest bi derziyên harê kirin û herêm kirin bin parastinê. Piştî vê bûyerê şîr û berhemên şîr ên li vê herêmê rawestandin. Beytaran diyar kir ku dema kef bi ser devê mirovan bikeve, ji avê bitirsin, felç, herareta mirov zêde bibe û bend bibin divê bi lezgînî serî li rayedarên tenduristiye bidin.

*AMED - DÎHABER*

## Cara yekemîn jinek bû midûra muzeyê

**HEMA BÊJE** li tevahiya cîhanê rol û rista jinan a di nava civakê de her dem wekî kesên di rêza duyemîn de ye. Ji ber wê gelek caran li gelek welatan nûçeyên wekî jinek nû bû serok, an bû midûra filan saziyê, tên weşandin. Rewşeke wiha jî li Vatîkanê qewimî û ji bo Muzeyên Vatîkanê, cara yekê jinek wek midûra saziyê hat tayînkirin. Ji bo Muzeyên Vatîkanê, Barbara Jatta ya 54 salî wê ji îro û şûnde dest bi wezîfeya midûretiyê bike. Jatta, 20'ê kanûnê ji hêla Papa François ve hatibû erkdarkirin. Jatta, jina yekem e ku vê wezîfeyê dike. Jatta dê li şûna wezîrê berê yê çandê yê Îtalyayê Antonio Paolucci wezîfeyê bike. Muzeya Vatîkanê, beşeke wê li Qesra Vatîkanê ye, bi galeriyeke 7 kîlometre fireh, koleksiyona hunerê ya mezintirîn diparêze. Di nav van muzeyan de Dêra Sixtine jî heye. VATÎKAN



## Yekitiya Ereban:

# Ev yek dê aştiyê xirab bike

**Yekitiya Ereb bertek nîşanî axaftinên Trump ên wekî 'Dê DYA balyozxaneyên xwe yên li Tel Avîvê bîne Qudsê' da û got: "Ev yek dê hevdîtinên aştiyê xirab bike" û xwest dest ji vê pêkanînê berde**



Sekreterê Giştî yê Yekitiya Ereban Ahmed Ebu Gayt, bal kişand ser axaftinên Serokê DYA'yê nû Donald Trump ên wek 'Dê DYA balyozxaneyên xwe yên li Tel Avîvê bîne Qudsê' û aşkera kir ku ev dê hevdîtinên aştiyê xirab bike. Gayt da zanîn demên borî di navbera Israîl û Filistînê de hevdîtinên aştiyê dihatin kirin, heke Trump van axaftinên xwe bixe meryetê dê aştiyê xirab bike.

Berdevkê Yekitiya Ereban Mahmud Afîfî jî di daxuyaniya nivîskî de anî ziman ku wî bi Sekreterê Giştî yê Rêxistina Rizgariya Filîstînê (RRF) Saîb Ureykat re li paytexta Misrê li Qahîreyê hevdîtinek pêk aniye, di mijara wan de ev axaftinên Trump hebûne û di vê hevdîtinê de jî nerazîbûna li dijî van axaftinan derketine pêş.

Ureykat jî piştrast kir ku wan ev mijar nirxandiye û di vê der barê de ev tişt got: "Biryareke rayedarên DYA'î ya bi vî rengî dê di serî de di gelê Filistînê û hemû alema Îslamê de pêşî li bûyerên mezin veke."

**PROJEYA KIŞANDINÊ**

Li gorî Qanûna Balyozxaneyê Qudsê ya di sala 1995'an de ji hêla rayedarên DYA'yê ve hatiye îmzekirin, diviya bû balyozxaneya xwe ya li Kudusê bikişandana, lê qanûna ku qala wê tê kirin, 21 sal e di serdemên serokatiya Bill Clinton, George W. Bush û Obama de her 6 mehan carekî bi hincetên 'Ewlehiya neteweyî' tê paşvexistin.

Serokê DYA'yê Trump ê ku nû hat hilbijartin, di waadên xwe yên hilbijartinê de soza ku ew ê balyozxaneyên xwe yên li Tel Avîvê bîne Qudsê dabû. Lê filistînî vê yekê wekî 'Dixwazin Quds wekî paytexta Israîlê kifş bikin' pênase dikin û ji ber ve li dijî vê biryarê derdikevin. Qudsa rojhilat ji sala 1967'an vir ve di bin dagirkeriya Îsraîlê de ye. *QUDS*



## 'Operasyon ber bi dawiyê ve diçe'

Operasyona Mûsilê ya ku bi mehan e hatiye destpêkirin, berdewam dike. Serokwezîrê Iraqê Haydar el-Îbadî da zanîn ku plana wan baş tê hûnandin û got ku "Operasyon ber bi dawiyê ve diçe." Îbadî piştî ku Fernamdariya Operasyona Hevbeş ziyaret kir, li ofîsa xwe daxuyanî da û diyar kir ku ew ê Mûsilê ji DAIŞ'ê bistînin û wiha axivî: "Operasyona Mûsilê ya ku navê 'Em tên Nînova' lê hatiye kirin, dewam dike û dike biqede." Îbadî destnîşan kir ku hêzên Iraqê di nava Mûsilê de bi hêzên DAIŞ'ê re şer dikin û got: "Neyar (DAIŞ) êdî têk diçe." Îbadî sêşema derbasbûyî dabû zanîn ku ji bo ku DAIŞ li Iraqê biqede, pêwîstiya wan bi 3 mehan heye. BEXDA



Li Necefê êrîşa bombeyî:

## Gelek kes mirin

Şêniyên Necefê yên Iraqê bûn hedefa êrîşeke bombeyî û gelek kes mirin. Êrîş li bajarê Necefê ku 160 km dûrî paytexta Iraqê Bexdayê ye, li taxa Qadiseyî serê sibehê bi wesayiteke bombebarkirî pêk hat. Di encama teqînê de gelek polîs û karmendan jiyana xwe ji dest da. Piştî êrîşê hêzên ewlehiyê cihê bûyerê dorpêç kir, gelek birîndar rakirin nexweşxaneyan û kesên ku jiyana xwe ji dest da jî rakirin morgan. Li Necefê ku piraniya şêniyên wê şiî ne, der barê hejmara mirî û birîndaran de agahî nehatin wergirtin. BEXDA



## Li DYA'yê 2 şûnwarên rûsî vala kirin

Bi hincetên wek 'Ajanên rûsî beşdarî cihên li Maryland û New Yorkê dibin' du cih hatin valakirin. Berdevkê daîmî yê Neteweyên Yekbûyî (NY) yê Rûsyayê Vîtaly Churkin diyar kir ku cihên hatine girtin, cihên populer ên dîplomat û malbatên rûsî ne. Serokê DYA'yê Obama, berî çend rojan diyar kiribû ku ev cihên li Maryland û New Yorkê ji hêla Rûsyayê ve wek 'cihê îstîxbaratê' tên bikaranîn, dê bên girtin. Li ser van daxuyaniyan ev cih hatin valakirin. Malîkaneya ku di sala 1913'an de ji bo George du Pont Pratt hat avakirin, di sala 1952''yan a serdema Yekitiya Sovyetê de ji hêla rayedarên rûsî ve hatibû kirîn û ev cihê seyrana rûsan bû. NEW YORK

## Konseya Ewlehiyê agirbest qebûl kir


Şer û pevçûnên li Sûriyeyê ku di navbera hêzên muxalif û rejîma Sûriyeyê de bi salan e didome, bi lîstik û bazarên hêzên navneteweyî geh bi agirbesan hat rawestandin û geh jî bi avakirina komên çete berdewam kir. Di şerên çend salên dawî de bi sed hezaran mirov hatin qetilkirin, ji xwe qala koçberî û birîndaran nayê kirin. Herî dawî agirbesteke nû li Sûriyeyê hat îlankirin û ev agirbest ji hêla Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî ve jî hat destekkirin. Konseya Ewlehiyê ya NY'yê biryara têkildarî lihevkirina agirbestê ya li Sûriyeyê pejirandiye. AMED

## Dê hêzên li Iraqê ziyaret bike

Serokê Fransayê François Hollande ragihand ku bi armanca serdana hêzên xwe yên li Iraqê dê biçe Iraqê û hêzên xwe yên li Iraqê dijî DAIŞ'ê şer dikin, ziyaret bike. Hollande di peyama xwe de wiha got: "Heya niha êrîşên terorê yên li dijî Fransayê bi dawî nebûne. Divê em şerê li dijî terorê, hem li welat û hem jî li derveyî welat bidomînin. Nêzikî 500 leşkerên Fransayê li Iraqê hene. Ev hêzên Fransayê bi hêzên leşkerî yên artêşa Iraqê re li dijî çeteyên DAIŞ'ê şer dikin. Her wiha Fransayê bi Amerîkayê re di sala 2014'an de li dijî çeteyên DAIŞ'ê yên li Sûriye û Iraqê şer dikin, peyman çêkiriye. PARÎS

# Êrîşa Ortakoyê
## hat şermezarkirin

Di êrîşeke çekdarî ya li Ortakoyê ya Stenbolê de ku li dijî welatiyên sîvîl pêk hat, 39 kes hatin qetilkirin û bi dehan kes jî birîndar bûn. Li tevahiya cîhanê peyamên şermezarkirinê hatin weşandin. Di serî de li DYA, Kanada, Konseya Têkiliyên Îslam-Amerîkayê (CAIR), Sekreteriya Giştî ya NATO'yê, Yekitiya Ewropayê, Parlamentoya Ewropayê, Almanya, Awusturya, Belçîka, Fransa, Meksîka û gelek welatên din peyamên sersaxiyê weşandin û diyar kir ku ew êşên malbatên ku xizmên wan hatine qetilkirin, parve dikin û naletê li terorê tînin. *AMED*



# Hollande û Macron tên ecibandin

Li gorî anketa Harris Interactive, di nava gel de qîmeta François Hollande ku biryar da tev li hilbijartinên serokomariyê nebe, zêde bûye. Her wiha desteka ji bo wezîrê berê yê aboriyê Emmanuel Macron zêde dibe.

Li gorî anketê siyasetmedarê ku fransî herî zêde jê bawer in, wezîrê berê yê aboriyê û namzetê serokomariyê Emmanuel Macron e. Baweriya bi serokwezîrê berê û Şaredarê Bordeauxê Alain Juppê ku di pêşhilbijartina di nava partiyên rastgir de winda kir, bi 6 pûanan kêm bû û daket ji sedî 37'an. Baweriya bi François Fillon ê li pêşberî Juppê di pêşhilbijartinê de bi ser ket û namzetê rastgiran ê ji bo serokomariyê ye, ji sedî 31 e.

Li aliyê din baweriya bi François Hollande ku aşkera kir ew ê nebe namzet, bi 3 pûanan zêde bû. Ji sedî 25'ê fransiyan ji Hollande bawer dikin. Desteka ji bo yek ji kesayetê girîng ê Partiya Çepgir (PG) Jean-Luc Melechon jî bi pûanekê zêde bû û gihaşt ji sedî 26'an.

Baweriya bi lîdera rastgir a tund Marine Le Pen jî 2 pûan kêm bû û daket ji sedî 22'yan. Di hilbijartinên serokomariyê yên meha nîsanê de tevî Jean-Luc Melenchon, namzediya Emmanuel Macron, Serokwezîrê berê yê rastgir François Fillon û Le Pen a ji rastigiriya tund, zelal e.

Partiya Sosyalîst a li desthilatdariyê (PS) û gelek partiyên din ên çepgir, ji bo diyarkirina namzeta/ê xwe dê di meha çileyê de hilbijartinên ji du tûran pêk tên, li dar bixin. *PARÎS - ANF*



www.arsivakurd.org

ROJEVA Medya
2 Çile 2017 Duşem

## Kurdên Îmaratê meclis ava kir

Desteya Rêveberiya Gelê Kurd ên dewleta Îmarata Yekbûyî ya Ereb bi alîkariya TEV-DEM'ê civînek bi kurdistaniyan re li dar xist. Di civînê de li ser navê TEV-DEM'ê Şivan Xabûrî axivî û pêşniyara avakirina meclisa kurdên li Îmaratê kir. Xabûrî got ku divê di meclisê de kurdên ji her çar parçeyên Kurdistanê tê de cih bigirin. Di dawiya civînê de meclisa hat avakirin û rêveberiya wê hat hilbijartin. Her wiha sê komîteyên 'Ragihandin, Darayî û Çandiniyê' jî hatin avakirin. ECMAN



## Nûnerên Şedadê diyar bûn

Yekitiya Mamosteyan a Hesekê û Navenda Perwerdeyê ya Şedadê ji bo diyarkirina nûnerên xwe yên ku dê tevli 4'emîn Konferansa Yekitiya Mamosteyan a Kantona Cizîrê bibin, civînek li dar xist. Di civînê de Hevserokê Yekitiya Mamosteyan a Kantonê Cizîrê Ezher Ehmed got ku ji bo civakeke demokratîk û zana rola herî girîng dikeve ser milê mamosteyan. Di civînê de rêziknameya yekitiyê hate xwendin û nîqaş hatin kirin. Di dawiyê de jî 6 mamoste wekî nûnerên Şedadê hatin hilbijartin. HESEKÊ



## Avê li şêniyên taxa xwe belav dike

Ji ber şerê li Helebê, febrîqeya taxa Silêman El Helebî ya ku ava vexwarinê lê dihat amadekirin, ziyaneke mezin dît. Bi zirar dîtina febrîqeyê jî welatiyên taxê pirsgirêka avê jiyan û ji bo çareseriya pirsgirêkê ketin nava tevgerê. Tevî ku bazirganên avê rojane bi deboyan li taxan avê difiroşin jî, ev yek nehat çareserkirin. Welatiyê bi navê Mihemed Xelîl ê taxa El Heyderiyê jî beriya şer tedbîra xwe digire û bîra li ber deriya mala xwe amade dike. Bi vê yekê jî Xelîl ava bîrê li welatiyên taxê belav dike. HELEB



## Kanalîzasyonên xirab paqij dikin

Xebatên Şaredariya Gel a bajaroka Til Hemîsê berdewam in. Piraniya kanalîzasyonên bajarokê ji ber ku ev demeke dirêje nehatine paqijkirin, xirabûn. Bi armanca paqijkirina kanalîzasyonê, şaredariya gel tevî hemû derfetên xwe yên kêm jî dest bi sererastkirin û paqijkirina xetên kanalîzasyonan kir. Hevşaredarên Şaredariya Gel a Til Hemîsê dan zanîn ku ew bi armanca parastina tenduristiya gelê bajarokê di xebitin û got ku ew ê li gorî derfetên xwe xebatên xwe bidomînin. GIRÊ SPÎ



# Artêşa tirk li Babê 17 sivîl qetil kirin

Hêzên artêşa tirk a dagirker li Babê komkujiyeke din jî pêk anî. Çavkaniyên ji herêmê dan zanîn ku di encama komkujiya artêşa tirk a li Babê de 17 welatiyên sivîl hatin kuştin û 155 welatî jî birîndar bûne.

Operasyona 'Mertala Firatê' ya ku artêşa tirk a dagirker bi armanca dagirkirina bakurê Sûriyeyê daye destpêkirin, didome. Di çarçoveya operasyonê de heta niha artêşa tirk bi sedan welatiyên herêmê qetik kirin. Li gorî agahiyên dawî yên ji herêmê, balafirên artêşa tirk di 31'ê kanûnê de li nêzî bajaroka Tadef a Babê sivîlên ku dixwestin xwe ji balafirên artêşa tirk rizgar bikin û derbasî herêmên ewle bibin, bombebaran kirin.

Çavkaniyên ji herêmê da zanîn ku di encama bombebarana artêşa tirk de bi qasî hatiye zelalkirin, 17 sivîlan jiyana xwe ji dest da û 155 welatî jî birîndar bûne. Heman çavkaniyê da zanîn ku di êrîşên li ser herêmê de, leşkerekî tirk ê bi navê Ayhan Kozhel ji malbata Şehûd 9 kes qetil kirine. BAB - ANHA



# 110 gund hatin rizgarkirin

**Fermandarên operasyona rizgarkirina Reqqayê da zanîn ku di qonaxa duyemîn a hemleyê de heta niha 110 gund, bi dehan gundik û gelek gir hatine rizgarkirin. Fermandaran got ku herî kêm 277 çete jî hatine kuştin**

Şervanên odeya çalakiyan di encama pêngava duyemîn a Xezeba Firatê de 110 gund, bi dehan gundik û gelek girên stratejîk rizgar kirin. Her wiha di encamê de 277 çeteyên DAIŞ'ê jî hatin kuştin.

Qonaxa duyemîn a Xezeba Firatê bi armanca rizgarkirina gundewarên rojavayê Reqqayê di 10'ê kanûnê de bi du baskên ji gundên Qadiriyê û Kerdoşanê destpêkiribû. Qonaxa duyemîn a hemleyê bi serkeftinên mezin di roja 22'yemîn de didome. Her wiha di şeva 31'ê kanûnê de jî şervanên Odeya Çalakiyan ji bajaroka Til Semin ê Eyn Îsayê bi du baskên din ketin nava tevgerê. Li herdû baskan pêşveçûna şervanan didome.

**277 ÇETE KUŞTIN**

Li gorî danayên fermandarên Odeya Çalakiyan a Xezaba Firatê, di 21 rojên qonaxa duyemîn de 110 gund, bi dehan gundik û gelek girên stratejik ji çeteyên DAIŞ'ê hatin rizgarkirin. Fermandaran dan zanîn ku di encama pevçûnan de jî bi qasî hatiye zelalkirin, 277 çete hatine kuştin û 13 jî hatine girtin. Her wiha çeteyek jî tevî malbata xwe teslim bûye.

**ÇEK BI DEST XISTIN**

Fermandarên Xezeba Firatê çek û cebilxaneya bidetsxistin jî wiha rêz kir: "109 keleş û 149 jarjor û 30 rext û 7 hezar fîşekên wê, 7 BKC û 3500 fîşek û 4 zincîrên wê, doçkayek 12,5 û 80 fîşekên wê, doçkayek 23,5, motorsîkletek, Pîkabek, kamyoneke bombebarkirî, 2 wesayîtên bombebarkirî, panzêrek, 2 çekên antî-tang, demanceyek, 5 roketên antî-tangê, dûrbînek, 9 bêtêl, 9 êlekên xwekujiyê, 49 bombeyên destan, 30 B-7 û 7 çenteyên wê, 4 katyûşa û 40 roketên wê, 3 hewanên 120 m û hawaneke 160 m." *REQQA - ANHA*




# Bajaroka Mahmûdiyê êdî rizgar e

Operasyona Xezeba Firatê li rojavayê Reqqayê didome. Di pevçûnên dawî de bajaroka stratejîk a Mahmûdiyê hat rizgarkirin.

Qonaxa duyemîn a Xezeba Firatê di roja 23'yemîn de didome. Di çarçoveya hemleyê de şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê hemleyeke nû ji hêla bajaroka Til Semin a Eyn Îsayê dan destpêkirin û li vê aliyê 6 km'yan pêşve çûn.

**PEVÇÛNÊN GIRAN**

Wekî ku tê zanîn li bajaroka Mahmûdiyê û gundê Caber Şerqî di navbera şervanên odeya çalakiyan û çeteyên DAIŞ'ê de pevçûnên dijwar di qewimîn. Di encama pevçûnên giran de li bajaroka Mahmûdiyê derbeyên giran li çeteyan hatin xistin û bajarok bi tevahî ji çeteyan hat rizgarkirin. Di pevçûnan de bi dehan çete hatin kuştin, 2 wesayîtên bombebarkirî, panzêrek û wesayîteke doçkabarkirî hatin rûxandin.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku bajaroka Mahmûdiyê xwedî cihekî stratejîk e. Çeteyên ku ji bo parastin bajarokê hêzêke mezin anîbûn li hemberî şervanan têk çûn. *REQQA - ANHA*

# ENKS'ê dijberên kurdan tercîh kiribû

TEV-DEM'e bi daxuyaniyekê îdiayên ENKS'ê bersivand û diyar kir ku ENKS serkeftinên Rojava nabîne û di dema şer de dijminên kurdan tercîh kiribûn.

Di daxuyaniyê de TEV-DEM'ê îdiayên ENKS'ê redkirin û ev tişt parvekirin: "Di şoreşa Rojava de hemû hewldanên dijminan bi saya tekoşîna zarokên gelê me, vala derketin. Bi berxwedana zarokên me û nêrîna nû, Rojava bû nimûneyek ji cîhanê. Her wiha ji bo yekitiya gelê kurd jî me gelek hewldan kirin. Lê ji ber hîn partiyan ev pêk nehat."

Di berdewamê de jî TEV-DEM'ê wiha got: "Me herî dawî ENKS jî di navde, banga kareke hevbeş ji hemû aliyan kir. ENKS'ê ev bang bi neyînî bersivand û bi îdiayên derew, em bi dîktatoriyê tewanbar kirin. Li hemû hevdîtinan girtine û di daxuyaniyên wan de niyeteke baş tuneye. ENKS dixwaze li hevpeymanên berê vegere lê em dibêjin niha rewşekê cudade heye û divê hevpeymanên nû çê bibin. Yên ku serkeftinên zarokên Rojava nabînin, çawa daxwaza ji me dikin?"

Daxuyanî wiha bi dawî bû: "Dema ku zarokên me ji bo gelê xwe, xwe feda dikir, ENKS'ê ji qada kurdî dûr bû, tenê rexne dikir. ENKS'ê berê xwe da Tirkiyeyê û bi dijberên kurd re hevdîtin kir. Daxuyaniya ENKS'ê de gelek mijarên dûrî aqil hene. Tevî hemû êrişan jî em ji yekitiya gelê xwe bi bawerin û ji hemû danûstandinên ji bo vê yekê jî re amade ne." *QAMIŞLO - ANHA*



# Tirkiyeyê êrîşî Minbic û Efrînê kir

Hêzên artêşa tirk a dagirker bi topên hewanê êrîşî Minbicê kir. Di encama topbarana artêşa tirk de 2 welatiyên jin birîndar bûn. Her wiha artêşa tirk di şeva 31'ê kanûnê de êrîşî gundê Meydan Ekbesê kir.

Li gorî agahiyên ji herêmê, artêşa tirk di 1'ê çileyê de ji gundê Şêx Nasirê bi topên hewanê êrîşî navenda Minbicê kir. Di encamê de gelek topên hewanê li taxa El Sebai Behrat a Minbicê ketin. Di encama topbarana artêşa tirk de du jin birîndar bûn û ziyanên madî pêk hatin. Welatiyên birîndar rakirin Nexweşxaneya Berkel a Minbicê.

Her wiha hat zanîn ku artêşa tirk di şeva 31'ê kanûnê de gundê Meydan Ebesê Racoya Efrînê jî gulebaran kir. Li gorî agahiyên ji herêmê, di encama gulebarana artêşa tirk de ziyanên madî pêk hatin.

YPG'ê jî bi daxuyaniyekê diyar kir ku artêşa tirk a dagirker di şeva 30 heta 31'ê kanûnê bi çekên giran êrîşî gundên Girbenav, Koran, Carikli û Qeremox ên li rojhilatê Kobanê kirine. MINBIC - ANHA

## 146 rojnameger girtî ne



Însiyatifa Rojnamegerên Azad, rapora binpêkirina mafên çapemeniyê ya 2016'an bi raya giştî re parve kir. Di raporê de hat diyarkirin ku sala 2016'an di milê çapemeniyê de li gorî salên borî binpêkirina mafan derket asta herî jor.

Însiyatifê di raporê de anî ziman ku di 2016'an de 352 rojnameger hatin binçavkirin û 109 rojnameger hatin girtin û niha 146 rojnameger girtî ne. Di salekê de 318 weşanên çapemeniyê hatin girtin û astengkirin. Ji van 88 rojname, 17 kovar, 30 weşanxane, 5 ajansên nûçeyan, 120 Radyo-tv, 58 malperên nûçeyan ên înternetê hatin girtin. Di serdema OHAL'ê de 28 tv, 32 radyo, 51 rojname, 17 kovar, 30 weşanxane, 5 ajansên nûçeyan hatin girtin. Bi giştî 318 saziyên weşanê hatin girtin. Her wiha nasnameyên rojnamegeriyê yên 780 rojnamegeran û pasaportên 49 rojnamegeran hatin betalkirin. Herî kêm 2 hezar û 619 rojnameger ji kar hatin dûrxistin û bi sedan rojnameger ji ber saziyên wan hatin girtin, betal man.

Berdevkê Însiyatifa Rojnamegerên Azad Hakki Boltan rapora 2016'an nirxand û diyar kir ku li gorî salên borî êrîşên li dijî çapemeniya azad zêde bûn û wiha axivî: "Li gorî êrîş û zordestiyan çapemeniya azad peywira daye ser milê xwe, bi cîh anî. Ji ber ku xwestin rastiyên li herêmê pêk tên tarî bikin. Li gel hemû astengiyan rastî gihaştin raya giştî. Ev nîşaneya serkeftinê ye. Bila bizanin ku çapemeniya azad bi mohrkirinê nayê bêdengkirin. Ji ber ku çapemeniya azad xweser e. Çapemeniya azad dewlet esas negirt, gel esas girt."

Boltan diyar kir ku xebatkarên çapemeniya azad bi mîrasa Apê Musa û Gurbetellî Ersoz xwe gihandiye van rojan û wiha got: "Mîrasa çapemeniya azad dê ji vê rojê şûnde jî azad be. Sala 2017'an dê bibe azadiya rojnamegerên azad ên di girtîgehan de." **AMED - DÎHABER**

# Kampa êzidiyan tê valakirin

**Piştî ku çeteyên DAIŞ'ê êrîşî Şengalê kir bi sed hezaran êzidiyan cih û warên xwe terk kirin. Êzidiyên ku hatin Amedê îcar jî bi zilma AKP'ê û qeyûm re rû bi rû mane, kampa êzidiyan tê valakirin û êzidî dîsa koçber dibin**



Welatiyên êzidî yên ku piştî Şengal di 2014'an de ji aliyê DAIŞ'ê ve hat dagirkirin koçber bûn, hatin Amedê û li Kampa Fîdanlikê ya Şaredariya Yenîşehîrê bi cih bûn, piştî ku qeyûm tayînî şaredariyê kirin bi fermana Walîtiya Amedê li Kampa AFAD'ê ya Midyadê tên bicihkirin.

Qeyûmê ku bi serokê AFAD'ê re çû kampa êzidiyan, li vir bi welatiyên êzidî re hevdîtin pêk anî û ji wan re got dê wan bibin kampa AFAD'ê. Piştî vê hevdîtinê niha welatiyên êzidî ji kampê dibin.

**DIBIN MIDYADÊ**

Bi rojan e ev mijar dihat nîqaşkirin û parlamentera HDP'ê ya Amedê Feleknas Uca jî mijar biribû rojeva meclisê. Piştî nîqaşên ku bi rojan e berdewam dikin, welatiyên êzidî îro bi otobusan dibin kampa AFAD'ê. Pêdiviyên welatiyên êzidî 3 sal in ji aliyê şaredariyên DBP'î ve dihatin bicihanîn, welatiyên êzidî nedixwest ji kampê biçin û li kampa AFAD'ê bi cih bibin ev yek gelek caran anîbû ziman.

**NAXWZIN BIÇIN**

Kampa ku tê valakirin, êzidî bi ciwan, bi kal û pîr û zarokan ve tiştên xwe kom dikin. Kampa ku hezar û 23 welatiyên êzidî lê dijîn, jin tiştên xwe dikin torbeyan, ciwan jî birin wesayîtan. Yek ji êzidiyên ku got gelek caran gotine naxwazin biçin lê mecbûrî vê yekê hatine kirin, heta niha jî 6 caran cih guherandine. Welatiyê êzidî wiha axivî: "Me jiyana xwe sererast kiribû lê careke din dibêjin em ê cihê we biguherînin. Berê dema ku ev der di destê DBP'ê de bû, em rehet bûn. Bi hatina qeyûm re di encama pêkanînên kêfî de me ji vir derdixin. Em naxwazin biçin lê mecbûr in. Wekî din jî alternatîfa me tune ye."

Jineke êzidî jî wiha got: "Ji destê me be axa xwe naterikînin. Lê em neçar in. Dixwazin em ji vir derkevin. Em mecbûr in derkevin. Tiştekî ku em bikin tune ye." Welatiyekî din jî wiha axivî: "Hin welatiyên êzidî li dijî biryara valakirinê derketin. Rayedarên kampê got divê kamp di nava 10 rojan de bê valakirin. Gotin dê av û ceryanê qut bikin û xwarinê nedin, ji ber vê yekê jî gotin hûn nikarin li vir bijîn."

**ELEQEYA QEYÛM!**

Hate zanîn ku qeyûmê ku hatiye tayînkirin bi eleqeyeke "taybet" nîşanî kampê daye. Rayedarekî AFAD'ê got ku destûr nehatiye dayîn ku çapemenî bikeve hundirê kampê û heta 10 rojan welatiyên êzidî dê li Kampa AFAD'ê ya Midyadê bên bicihkirin. Li gorî agahiyên rayedarên AFAD'ê heta niha li Pirsûs, Meletî û Midyadê hatiye mêzekirin û herî dawî ji bo Midyadê biryar hatiye dayîn. *AMED - DÎHABER*

# Ji bo siyasetmedaran cezayê muebbetê

Li Erdîşa Wanê, hevşaredarên şaredariya navçeyê Dîba Keskîn û Abdurrahman Çagan, rêveberên HDP û DBP'î jî di nav de, doza 11 jê girtî 38 siyasetmedar lê tên darizandin, dozger mutalaaya xwe da.

Dozgerê bi tewanbariya "endamtiya rêxistinê" îdianameya xwe amade kir, di mutalaaya xwe de der barê 38 siyasetmedaran de bi îdiaya "Xerakirina yekîtî û yekpareyiya dewletê" cezayê muebetê xwest. Di mutalayê de girtina 27 kesên bi awayekî negirtî tên darizandan de jî hat xwestin û her wiha daxuyaniyên KCK'ê yên di dîrokên cuda de jî wek delîl bên hesibandin.

Di mutalaayê de, hat îdiakirin ku, li navçeyê êrîşên cuda yên li dijî leşker û polîsan pêk hatine jî, têkildarî daxuyaniya "xwerêveberiyê" ne.

Daxuyaniya "xwerêveberiyê" ya di 12'ê cotmeha 2015'an de li Kolana Zîlanê ji aliyê Berdevkê Meclisa Gel a Demokratîk a Erdîşê Erhan Basut hatibû xwendin, wiha bû: "Em ê li ser esasê xwerêveberiya demokratîk, çareseriya xwe bi pêş ve bibin. Em ê bi biryarên meclîsên bi îradaya gund, tax û bajarokên me bên dayîn xwe bi rê ve bibin. Em dewleta her roj komkujiyan pêk tîne û hêza wê ya polîsan naxwazin. Em naxwazin bi derewa ewlehiya cemaweriyê jî bên qetilkirin. Em ê wek civak bi xwe ewlehiya xwe pêk bînin. Em ê hemû divitiyên civakî bi cih bînin. Bêyî em muhtacî saziyên dewletê bibin, bêyî em rastî çewisandin û pêkutiyên saziyên dewletê bên, em ê îradeya civakeke azad, li ser esasên xwerêveberiyê nîşan bidin. Ji niha û pê ve jî, em ê xwe bi xwe bajarê xwe bi rê ve bibin. *WAN*



## Kêfa wê bi kurdî hat



Zimanzan û endama Lijneya Şêwira Weşanê ya rojnameya Ozgur Gundemê Necmiye Alpay a di 16'ê Tebaxê de polîsan bi ser mala wê de girt û bi îdîaya "endamtiya rêxistinê" hat binçavkirin û şandibûn Girtîgeha Bakirkoyê ya Jinan.

Necmiye Alpay, endama Lijneya Şêwira Weşanê Asli Erdogan û Gerînendeyê Weşana Giştî yê Ozgur Gundemê Zana Kaya di 29'ê kanûnê de serbest hatin berdan. Alpay dema serbest hat berdan li pêş girtîgehê ji aliyê hempîşe, heval, hogir û malbata xwe ve bi coşeke mezin hat pêşwazîkirin. Alpay a 78 salî, piştî ku hat berdan, li gel temenê xwe yê mezin bi koşê kolana Ozgur Gundemê de meşiya û hat ber avahiya rojnameya Ozgur Gundemê û avahî ziyaret kir. Alpay da zanîn ku di girtîgehê de fêrî kurdî bûye û wiha got: "Kesên entelektuel di her şert û mercî de rexne dikin. Ziman û kurdî mirovan mezin dike. Pir zimanekî xweş e. Ez ê fêrbûna xwe ya kurdî berdewam bikim. Ez silavên xwe ji girtiyên C-9, C-10, B-6 re dişînim." **STENBOL - DÎHABER**

www.arsivakurdi.org

# Sala nû ya Ocalan pîroz kirin

Li bajarê Strasboûrg ê Fransayê nêzî 5 sal in ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan çalakiya nobedê tê lidarxistin. Çalakiya nobedê ji aliyê endamên Tevgera Jinên Azad a Ewropayê (TJK-E) dewr hat girtin.
Komeke ji 13 kesan ên endamên Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) ên li bajarê Ûlm ê Elmanyayê dijîn, li pêşiya avahiya Konseya Ewropayê, çalakvanên nobeda azadiya ziyaret kirin. Endamên PYD'ê sala nû ya Rêberê Gelê Kurd û berxwedêran pîroz kir û panoya li ser bi kurdî "Sersala Rêbertiya me pîroz be"nivîsandibûn, hat vekirin.
Di axaftinên endamên PYD'ê de hate diyarkirin ku ji bo azadiya Ocalan dê têkoşîna xwe bidomînin.
**STRASBOÛRG - ANF**





## Cezayê hepsa malê li jina ducanî birîn

YASÎN KOBULAN - STENBOL - DÎHABER

**Li Esenlerê, jina ducanî Merve Dînç Çîftçî ya di nav hefteyê de hatibû binçavkirin, parvekirinên wê yê Facebookê wek hincet hatin nîşandan û ji aliyê dadgeha bi îdiaya "Endamê rêxistinê" sewqî wê hat kirin, bi cezayê hepsa malê serbest hat berdan.**
**Di dema lêpirsînê de, parvekirinên civaka medyayî yeko yeko ji Dînçê hatin pirsîn. Parvekirina Dînçê ya ji bo şervana YPG'ê Viyan Peyman "Şehîda me rûmeta me ye Viyan Peyman... Şehîd Namirin" wek sûc hat hesibandin.**
**Li gel vê, parvekirina wê ya "Rizgarkirina Şengalê pîroz dikim. Bijî YPG, YPJ, YBŞ" jî wek "propagandaya rêxistinê" hat hesibandin. Parvekirina wêneyên 3 jinên siyasetmedar Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez ên di 9'ê çileya 2013'an de li Parîsê hatin qetilkirin jî wek sûc hatin hesibandin.**
**Piştî lêpirsînê, Dînç sewqî Edliyeya Stenbolê hat kirin û bêyî ji aliyê dozgerê edliyeyê ve îfadeya wê bê wergirtin bi hinceta "propagandaya rêxistinê" û daxwaza girtinê sewqî dadgeha nobedar hat kirin. Heyeta dadgehê, daxwaza dozgeriyê red kir û der barê Dînçê de ji hukmên venêrîna edlî biryara cezayê hepsa malê da.**
**Piştî vê biryarê, dê Dînç êdî nekare ji malê derkeve. Her wiha dê Dînç, li hundirê malê bi kelepçeya elektronîk jiyana xwe bidomîne. Di serlêdana li dozgeriyê hat kirin de jî, hat diyarkirin ku dê Dînç bêyî destûra dozgeriyê nekare derkeve derve.**

# Daxwazên ji bo sala nû

**Sazî û nûnerên siyasî yên ji bo sala 2017'an temiya aştî û demokrasiyê kir, peyama bi hêviya sala 2017'an bibe sala têkoşînê da. Nivîskar Umît Kivanç wiha got: "Xwedê ji bo me wijdan, sebr û aqil, ji bo hinekan jî bela xwe bide."**














Gelek sazî û nûnerên siyasî ji bo sala 2017'an temiya aştî û demokrasiyê kir û peyam dan. Ji wan peyaman hinek ev in:

Parlamenterên HDP'ê yê berê Hasîp Kaplan: Bila mirovatî bê, çimkî di 2016'an de hem li welatê me hem jî li herêma me li dijî mirovahiyê hin sûcên şer pêk hatin. Em bûn şahidê vê zilmê. Li girtîgehan cih nema. Bêaramî, bêedaletî û her roj nûçeyên mirinê hebûn. Dixwazim demildest ji 2016'an xelas bibim. Dema li van hemûyan dinihêrim û difikirim, daxwaza mirovatiyê dikim. Ji 2017'an tekane bendewariya min, mirovatî, bextewarî nema, bila edalet, aştî û mirovatî bê.

Sekretera Giştî ya Konfederasyona Sendîkayên Karkerên Şoreşger (DÎSK) Arzu Çerkezoglu: "Sala 2016'an li Tirkiyeyê sala şer, komkujiyan, mirinan bû. Temiya min ew e ku, sala 2017'an bi xwe re aştî û demokrasiyê bîne welat. Lê em dizanin ku ev xwesteka me, tenê bi xwestinê nabe, divê em tê bikoşin. Bi vê baweriyê, di sala nû de, ji bo hemû karker û kedkaran, gelên bindest, hemû gelên cîhanê aştî û demokrasiyê dixwazim.

Nûnera Giştî ya Platforma Em ê Cinayetên Jinan Rawestînin Gulsum Kav: Di vê salê de jinan saleke zor û zehmet derbas kir, lê di heman demê de berxwedanên mezin jî xwe da der. Li gel hemû zor û zehmetiyan jî netepisiyan, îsal jin tê koşiyan. Dixwazim di vê sala nû de jî rûyê jinan bikene, li gorî dilê xwe bigerin, saleke xweş derbas bikin. Dixwazim bibe saleke ku jin neyên kuştin. Helbet di şert û şirûtên Tirkiyeyê de divê em tê bikoşin.

### ARAMÎ Û AŞTÎ

Xwişka Hasan Ocak ê di bin çavan de hat windakirin, ji Mirovên Şemiyê Masîde Ocak: Em di dema ketin sala nû de jî li Galatasarayê bin. Îro li Tirkiyeyê rejîma ku hikum dike, ne demokrasî ye. Xwesteka me ya sala nû, serdestiya hiqûqê, aramî û aştiya vê xakê ye. Xwesteka me ya sala nû, xwegihandina windahiyan e. Avakirina rejîmeke demokratîk, ku em karibin hesabê wan bipirsin. Divê di sala nû de, ji bo sûcê windakirina di bin çavan de dubare nebe, hin sererastkirin bên kirin. Ji ber vê em ê têkoşîna xwe bidomînin."

### SALEKE TARÎ

Hevserokê Komeleyên Elewiyên Demokratîk (DAD) a Stenbolê Bulent Felekoglu: Me saleke tarî derbas kir. Her rojek bi me xwezî bi duh bû. Bi hêviya sala nû, ji bo gelên kurd, elewî, tirk aştî û aramiyê bîne û divê em têkoşînê zexmtir bikin. Em hêvî dikin, sala nû ji bo hemû gelan bibe sala aştî û hêviyê.

### SIYASETA AZAD

Hevseroka Giştî ya ÎHD'ê Parêzer Eren Keskîn: Sala 2016'an kabîsek bû. Mirin, îşkence, bêedaletî... Hêvî dikim ku di sala 2017'an de dawî li vê kabûsê bê, li hemberî miriyên xwe em deynê xwe bidin, dawî li rijandina xwîna li Rojhilata Navîn bê. Dixwazim di sala 2017'an de wijdan li lûtkeyê be. Û ez ji bo hevalên xwe yên di girtîgehê de; Selahattîn, Aysel, Ayla û hemûyan azadiyê dixwazim û bi hêviya vegerin siyaseta azad. ***STENBOL***

## Em piştevaniya Nisêbînê MEZIN BIKIN

Hêzên dewletê, ku li Nisêbînê bi êrîşan bi mehan navçe hilweşand, niha jî bînayên saxlem xira dikin, hildiweşînin û talan dikin.

Berdevka Însiyatîfa Dayikên Aştiyê ya Nisêbînê Perîhan Altog, nerazîbûna xwe ya li dijî hilweşîn û talana li taxên Zeynelabîdîn, Kişla, Abdûlkadîrpaşa, Firat, Dîcle û Yenîşehîr ên Nisêbînê anî ziman û diyar kir ku hêzên dewleta tirk sûcên şer dikin û destnîşan kir ku wê hesabê vî sûcî bipirsin.

Altog diyar kir ku êdî wehşet û neheqiya ku dewleta tirk li Nisêbînê dike dilan disoje û êdî asta vê hovîtiyê ji bo wan gihaştiye qirikê. Altog anî ziman ku dewleta tirk hovîtiyan li cenazeyên wan dike, destûra şînan jî nade, bi vê jî têr nabe, niha jî malan talan dike. Altog derbirî ku êdî ne mimkûn e gelê Nisêbînê vê wehşetê qebûl bike û wiha axivî; "Helbet, em ê vê qebûl nekin, helbet dê dewlet hesabê vê bide û dê gelê Nisêbînê van hovan efû neke."

### MALÊN XWE DIXWAZIN

Altog ragihand ku gelê Nisêbînê dixwaze vegere malên xwe, lê hêzên dewletê bînayên saxlem jî hildiweşîne û nisêbînî naxwazin di ew bînayên TOKÎ'yê de ku dewleta tirk plan dike çêke, bimîne. Altog, bi lêv kir ku gelê Nisêbînê, hîç nebe dixwaze li ser axa xwe di konan de bijî û wiha pê de çû; "Bila dest ji me berdin, em li ser xaka xwe bijîn, malên me hilweşandin, hê hildiweşînin. Ji bo me kon jî be, jiyana li ser xaka xwe girîng e. Dewlet bila dawî li vê wehşetê, sûcê mirovahiyê bîne."

### HILWEŞÎNÊ RAWESTÎNIN

Altog, di serî de gelê Kurdistanê, bang li tevahiya raya giştî ya bihîzyar kir ku ji bo rawestandina vê hilweşînê li ber xwe bidin û wiha got: "Ev wehşet e, sûc e, guneh e. Li dijî van kiryaran, divê tevahiya gelê kurd tê bikoşe û divê her kes rabe ser piyan." **MÊRDÎN**

## Sê daxwaz pêşkêşî hikumetê kirin

'Komîteya Leşkerên Tirk Derkevin' li Silêmaniyê daxuyanî da û sê daxwaz pêşkêşî desthilatdariya Herêma Federal a Kurdistanê kirin. Her wiha komîteyê diyar kir ku divê tu aliyek bi hinceta hebûna PKK'ê, li hemberî xwerêveberiya demokratîk a Şengalê êrîşan pêk neyne. Daxuyanî ji aliyê endama komîteyê, Mijde Elî ve hat xwendin. Komîteyê daxwazên xwe wiha rêz kirin: "Daxwaz dikin ku hikumeta Herêma Kurdistanê ji ser xaka başûrê Kurdistanê leşkerên tirk derxe. Bila Hikumeta Herêma Kurdistanê xwerêveberiya Şengalê bi şêweyekî fermî nas bike. Bila hemû alî ji bo pêkhatina kongreya neteweyî gavan biavêjin." Di daxuyaniyê de hat gotin ku li dijî sîstema dagirkerên dewletên herêmê yekitî û kongreya neteweyî şert e. Komîteya Leşkerên Tirk Derkevin di Cotmeha 2016'ê de li bajarê Silêmaniyê bi tevlîbûna gelek çalakvan, rêxistinên aliyên siyasî û kesayetan li dijî dagirkeriya dewleta tirk a li ser xaka Başûrê Kurdistanê hat avakirin. **SILÊMANÎ**



www.arsivakurdi.org




# ‘GELÊ ÊZIDÎ XWE BI XWE DÊ QEDERA XWE DIYAR BIKE’

ROJWAR KARAKOÇAN / ŞENGAL

Serokê Meclisa Avaker a Şengalê Xidir Salih diyar kir ku dê gelê êzidî vegere rojên beriya fermanê û ev tiştê anî ziman: “Tekane rêya pêşî lêgirtina fermanê Xweseriya Şengalê ye. Serê me jî biçe me qetil jî bikin êdî em ê nebin qurbaniyên siyasetên qirêjî. Em ê qedera xwe, xwe bi xwe diyar bikin.”

Serokê Meclisa Avaker a Şengalê Xidir Salih li ser avakirina Meclisa Avaker, armanca wê, erk û mîsyona meclisê ji rojnameya me Rojeva Medya re axivî. Salih da xuyakirin ku di fermana 3’yê Tebaxa 2014’an de nêzî 400 malbatên êzidî di çiyayê Şengalê de 3 mehan di çembera çeteyên DAIŞ’ê de man. Salih da zanîn ku di nava van kesan de ciwan, rewşenbîr û oldarên êzidî tevî malbatên xwe jî hebûn.

**Serokê Meclisa Avaker a Şengalê Xidir Salih da zanîn ku ji bo pêşîlêgirtina fermaneke din tekane rê îlankirina xweseriya Şengalê ye û wiha got: “Gelê êzidî xwe bi xwe dê qedera xwe diyar bike.”**


Di berdewamê de Xidir Salih da zanîn ku ew wek gelê êzidî êdî nikarin bê rêxistin û bê îrade jiyana xwe bidomînin û wiha pê de çû: “Ji ber ku TEVDA beriya fermanê jî di Şengalê de hebû û di naskirina rêxistinê de xwedî tecrûbe bûn. Êdî kesên mayî û TEVDA ji bo xwe birêxistinkirina xwe û êzidiyan nîqaş kirin. Ji ber ku em di çemberê de bûn, me meclis û rêveberiyek ava nekir. Lê fikra me ya avakirina rêxistin û rêveberiyekê çêbû. Piştî 18’ê kanûna 2014’an bi planekê bê ku şerek çêbe, çeteyên DAIŞ’ê ji bajarokê Sînonê yê girêdayî Şengalê heta Rebîa xwe vekişand û PDK hat şûna wan. Lê gund û herêmên din ji aliyê YBŞ’ê ve hatin rizgarkirin.”

**TECRÛBEYA ROJAVA**

Salih Xidir da zanîn ku piştî di 18’ê kanûnê de rêya di navbera Rojava û Şengalê de vebû, êzidiyên li Kampa Newroz a Rojava vegeriyan çiyayê Şengalê û wiha domand: “Bi hatina wan nîqaşên me yên birêxistinkirina gelê êzidî berdewam kirin. Careke din em û TEVDA hatin gel hev û em ji bo fikreke wekhev civiyan. Me xwest ji tecrûbeyên Rojava sûdê wergirin. Rexmê ku qebûlkirina Rojava di zagonên Sûriyeyê de nebûn jî lê di nava şoreşa Sûriyeyê de karîn bibin xwedî tecrûbe. Lê şens û derfetên me ji yên Rojava zêdetir in. Ji ber ku di zagon û madeyên Iraqê de destûr dide me em bikaribin bi awayekî xweser xwe bi rê ve bibin. Ya diket ser milê me ew bû ku em, valahiya siyasî, leşkerî û rêxistinî ya ku piştî fermanê li Şengalê çêbû, dagirin.”

**MECLIS AVA KIRIN**

Serokê Meclisa Avaker a Şengalê destnîşan kir ku di 14’ê çileya 2015’an de wan bi birêvebirina kongreyekê biryara avakirina Meclisa Avaker a Şengalê da û pêvajoya avakirina meclisê wiha vegot: “Di dîroka Êzidxanê de cara yekemîn e gelê me xwe bi rêxistin dike û li hemberî



deshilatdaran dengê xwe bilind dike. Bi avakirina meclisê gelê me xurt bû û bêdengiya xwe xirab kir û meclis ji aliyê oldar û ilimdarên me ve wek gaveke pîroz hat binavkirin û pîroz kirin. Gelek partiyên siyasî yên başûrê Kurdistanê jî bi daxuyaniyan avakirina meclisa me ya Şengalê pîroz kir. Her wiha Yekitiya Ewropayê jî bo statûya Şengalê biryar daye û ev biryar hatiye qebûlkirin.”

**PDK DIJBER DERKET**

Têkildarî helwesta PDK’ê ya avakirina meclisa Şengalê jî Salih Xidir ev tişt anî ziman: “Di dema ragihandina meclisê de gelek hêzên xêrnexwaz li hemberî me derketin. Dema me meclis îlan kir, Hikumeta Herêma Kurdistanê li hemberî avakirina meclisê derket. Bi taybetî jî PDK li hemberî meclisê derket. Heya PDK’ê xwest ku em meclisê xira bikin û ji bo reşkirina meclisê jî di ragihandinê de antîpropagandaya meclisê kirin. Lê me di aliyê zagonî de parastina xwe kir. Ji ber ku zagonên Iraqê bi xwe maf dide me ku em bikaribin xwe bi xwe xweser bijîn û biryarê bidin. Hem PDK û hem jî şiîyên Bexdayê li hemberî meclisê derketin. Di nava van 2 salan de meclisê karî pir karan bike û bandorê li ser rêxistinkirina gel çêke. Piştî van êrîşan, me gav paşde neavêt. Berevajî wê me biryar da û şaxeke meclisê me li Ewropayê vekir. Bi vê yekê jî me xwest ku ev şaxa me bila li Ewropayê daxwaz û parastina gelê me yê êzidî bike. Navê wê jî me kir Meclisa Dîasporayê. Meclisa Dîasporayê karî gelek hevdîtînên dîplomasiyê bi dewletên Ewropayê re bike û dengê Şengalê bigihîne dewletên derve.”

**ŞENGAL A ÊZIDIYANE**

Xidir Salih anî ziman ku beriya fermanê her kesî digot Şengal a min e û wiha berdewam kir: “Hebûna Iraqê ya li Şengalê tenê bi şiklî bû. Kesên digotin Şengal a min e dema 3’yê Tebaxê roja fermanê gel hişt û reviyan. Gelê sîvîl di nava destê çeteyan de hiştin. Beriya fermanê ji sedî 80 gelê êzidî bi PDK’ê re bû, lewre me qet bawer nedikir ku pêşmergeyên PDK’ê me bihêlin û biçin.”

**FERMANA DAWÎ BÛ**

Di dawiya axaftina xwe de jî Salih Xidir wiha got: “Êdî bi tu awayî Şengal wekî beriya fermanê nabe û wê nebe jî. Êdî teqez em destûrê nadin gelê me bibe listokên siyasetên qirêjî yên beriya fermanê. Ji bo pêşîlêgirtina fermanan tekane rê, xweseriya Şengalê ye. Em ê rêxistina xwe xurt bikin û li gorî qanûna Iraqê biçin. Li gorî wê jî em ê daxwaza mafê xwe bikin. Ger Iraq xweseriyê qebûl neke, deriyê Neteweyên Yekbûyî vekirî ye. Ger bixwazin carek din me di komkujiyan re derbas bikin, em ê heya dawiyê li ber xwe bidin û têkoşîna xwe bidomînin. Ev rêxistina ku hatiye çêkirin û ev fikrê ku ketiye nava gelê me, ger me tune bikin jî nikarin me ji vê fikrê xweseriyê bidin dûrxistin. Li dijî êrîşên hêzan jî dê artêşa me ya YBŞ/YJŞ’ê canê xwe bidw lê gel bê parastin nahêlin. Canê me jî biçe dê Şengal venegere beriya 3’yê Tebaxê. Vê yekê em bi awayekî vekirî li vir dibêjin. Gelê êzidî dê qedera xwe, xwe bi xwe binivîse. Ez bang dikim ku her kes û hemû dewlet piştgiriya xweseriyê bikin. Ji ber ku tekane çareserî ev e. Em pey doz û mafê xwe venagerin û gav paşde naavêjin.”

## Paşde gav neavêtin

**DI AXAFTINA** xwe de Xidir balkişand ser zextên li ser meclisê û ev agahî parve kirin: “Rexmî hemû astengî û rêgirtina ser Şengalê jî me paşde gav neavêt û me karê xwe berdewam kir. Ji ber piştgirî piştevaniya di aliyên madî û manewî de, em spasiyên xwe pêşkeşî rêveberî û gelê Rojava dikin. Her wiha tecrûbeyên xwe yên şoreşê bi me re parve kirin. Her wiha piştî meclisê, saziyên wekî Meclisa Jinên Êzidî, Meclisa Ciwanên Êzidî û hwd. da avakirin. Hemû saziyên ku karibin jiyana gel hêsantir bikin û gel bi rêxistin bike, me ava kir. Piştî xwe birêxistinkirinê, me karî li gel Iraq û gelek dewletên din hevdîtinên fermî pêk bînin. Ji ber ku xweseriya Şengalê û xwe bi xwe birêvebirina gelê êzidî nakeve bin berjewendiyên Bexdayê. Ji ber vê yekê jî parlementoya Iraqê heta niha jî meclis bi awayekî fermî qebûl nekiriye. Her wiha hikumeta Başûr jî bi temamî fikr, proje û meclisa me bi tevahî red dike. Sedemê vê jî ew e ku ev hewldana me ne li gorî berjewendiyên wan ên siyasî ye.”

## Barzanî alîkariya êzidiyan ji bîr kir

**DI AXAFTINA XWE** de Salih Xidir demên 1973’yan bi bîr xistin û wiha got: “Di wê demê de 147 gundên me ji çiya hatin dûrxistin. Lewre di dema fermanê de gundên ku ji çiya hatibûn dûrxistin dîl ketin destê çeteyan û gundên nêzî çiya jî karî xwe xilas bikin. Gelê êzidî her tim piştigirî daye partî û serhildanên kurdan. Sedemê gundên hatin xirakirin, piştgiriya gelê êzidî ya ji bo Mele Mistefa Barzanî bû. Di 2003’yan de dema PDK hate Şengalê, me got piştî ku me ew qas berdel dan ew ê alîkariya Şengalê bike. Ji bo wê em pir kêfxweş bûbûn. Di 2005’an de PDK’ê li gorî xala 140’an xwest Şengal heya 2007’an girêdayî hikumeta Başûr bikin lê Iraqê ev qebûl nekir. Ji ber vê yekê jî Şengal her tim bû cihê nakokiya her du hêzan. Piştî 2007’an mafê gelê êzidî ji aliyê hikumeta Başûr ve hate binpêkirin. Bûdçeya ji bo Şengalê dihat veqetandin, PDK’ê ji bo siyaseta xwe bi kar dianî. Ji ber wê jî gelê me yê êzidî gelek zext û zehmetî kişandin.”

## Sedema fermanê bêrêxistinî bû

**DI BERDEWAMÊ** de Xidir daxuyand ku yek ji sedemên herî girîng a fermana dawiyê, bêrêxistinbûna gelê êzidî bû û wiha derbirî : “Ger li şûna wan 12 hezar pêşmergeyên PDK’ê ciwanên êzidî hebûna, destûra komkujiyeke ew qas mezin nedida. Yan jî ger di wê demê de rêveberî di destê gelê Şengalê de bûya û biryarên xwe ji derve negirtana, dê fermaneke bi vî rengî pêk nehata. Lewre jî me biryar da ku em meclisek a ku gelê me xwe bi rê ve dibe û bi rêxistin dike, ava bikin. Ji ber ku her çi qas em hêzeke leşkerî jî ava bikin ger rêxistina vî gelî nebe, gel piştgiriyê nede vê projeyê, ango bi kurtasî civak nebe, serkeftina me jî ne mimkûn e.”

## Bi xêzên zarokan Şoreşa Rojava


**SAZIYA YEKITIYA GELAN** ji wêneyên ku zarokên dibistanan xêz kirine pêşangehek vekir. Di çarçoveya hemleya 'komuna xwe ava bike û bibe xwediyê federaliyê' Saziya Yekitiya Gelan a Kantona Kobanê ji wêneyên zarokên dibistana Şehîd Hogir pêşangehek vekir. Bi dehan zarokên dibistanên Kobanê tev li pêşangehê bûn. Di xêzên zarokan de şoreşa Rojava û parastina şervanên herêmê yên parastina şoreşa Rojava dikin, derketin pêş. Pêşangeh ji aliyê rêvebera Yekitiya Gelan Bêrîtan Asiya ve hat organîzekirin. Asiya ji bo zarokan wêne xêz kirine û amade kirine û kêfxweşiya xwe anî ziman û serkeftin ji zarokan re xwest. Di dawiya pêşangehê de zarokan awazên gelêrî û şoreşgerî gotin. **KOBANÊ**





## Fûara Pirtûkan a Enqereyê tê lidarxistin

11'emîn Fûara Pirtûkan a Enqereyê di navbera 6 û 15'ê çileyê de dê li ATO Congresiumê bê lidarxistin. Fûara ku dê 10 rojan berdewam bike, dê ji gelek pirtûkên weşanxaneyên li Tirkiyeyê re malovaniyê bike. Welatê mêvan ê fûara îsal dê Kazakistan be û tê payîn ku wêje û çanda Kazakistanê ji nêz ve bê şopandin. Dê gelek nivîskarên wekî Ahmet Şîmşîrgîl, Ahmet Umît, Emrah Serbes, Îsmaîl Saymaz, Ataol Behramoglu, Saygi Ozturk, Enver Aysever, Buşra Yilmaz, Hasan Elî Toptaş, Sînan Meydan, Muzaffer Îzgu, Osman Pamukoglu, Nermîn Şakraci, Murathan Mungan dê beşdarî fûarê bibin. **ENQERE**



## Fîlmê 'Qijika Reş' hat pêşandan

Fîlmê bi navê 'Qijika Reş' ku ji aliyê derhênerê kurd Tayfûr Aydin ve hatiye kişandin, li Stenbolê bi merasîmekê derket pêşberî temaşevanan. Di fîlmê Aydin de çîroka aktrîsteke îranî ku vegera wê ya welatê xwe qedexe ye, tê vegotin. Ev fîlm duyemîn fîlmê dirêj ê derhênerê ji bakurê Kurdistanê ye. Fîlmê ku li Fransa, Tirkiye û Kurdistanê hatiye kişandin. Derhêner Aydin da zanîn ku fîlm balê dikişîne ser rastiya li Rojhilata Navîn û wiha got: "Di fîlm de hemû rê li pêş wan sînor hene. Di rêwitiya aktrîstê de jî zehmetî û giraniya li wan sînoran tê vegotin û aktrîsta me bi çîroka xwe re rû bi rû dimîne û li xwe vedigere." **STENBOL**

# 'Diwahemîn Henarî Dunya'


### Romana Baxtiyar Elî ya bi navê 'Diwahemîn Henarî Dunya' serpêhatiya pêşmergeyekî vedibêje û ev pirtûka ku gelekî tê ecibandin li zimanên almanî û farsî hatiye wergerandin

Wêjevanê kurd Bextiyar Elî yê di sala 2016'an de mohra xwe li wêjeyê da, pirtûka wî ya bi navê 'Diwahemîn Henarî Dunya' bi navê 'Der letzte Granatapfel' wergerî zimanê almanî hat kirin. Pirtûk di nava 6 mehan de 4 çaran hat çapkirin û di lîsteya Lîtpromê ya romanan de di rêza yekemîn de cih girt.

Di rojên dawîn de li Almanyayê romana herî zêde tê nîqaşkirin, romana nivîskarê ji başûrê Kurdistanê Bextiyar Elî ye. Romana 'Diwahemîn Henarî Dunya' li Almanyayê cara yekem di meha adarê de hat çapkirin û di demeke kurt de çapên 2-3-4'emîn hatin kirin. Di naveroka romanê de pirsa 'nivîskarekî ew qas pênûsa wî xurt, çawa zêde nayê zanîn?' tê kirin.

Çîroknivîsê kurd Şêrzad Hesen, der barê Bextiyar Elî de van tiştan tîne ziman: "Bextiyar Elî nivîskarekî hêjayî ku Xelata Wêjeyê ya Nobelê ye, lê ji ber kurdbûna wî kes wî nas nake."

Bila nîqaşên der barê qalib û weşangeriya wêjeya kurdî de berdewam bikin, lê romana



'Diwahemîn Henarî Dunya' niha ji bo bibe pira di navbera wêjeya kurdî û cîhanê de gav bi gav bi pêş de diçe.

**8 ÇAP HATIN KIRIN**

Pirtûk ji hêla Ute Cantera-Lang û Rawezh Selîm ve wergerî zimanê almanî hatiye kirin, di sala 2002'yan de ji Weşanên Ranj orjînala wê bi zaravayê soranî yê kurdî hat çapkirin. Pirtûk di demên dawîn de cara 8'emîn bi zaravayê soranî hat çapkirin. Herî dawî di meha 11'emîn a sala 2016'an de çapa 7'emîn bi zimanê farisî hat kirin. Wergera wê ya farisî jî ji hêla Arash Sîncap ve hat kirin û li Îranê jî xwe gihand xwendevanan.

**DI 6 MEHAN DE 4 ÇAP**

Saziya wêjeyê Lîtprom ku ji bo danasîna wêjeya Asya, Afrîka û Amerîkaya Latînî xebatan dimeşîne, sponsoriya pirtûka 'Diwahemîn Henarî Dunya' dike û di 19'ê gulana 2016'an de bi zimanê almanî ji Weşanên Unionsverlagê li Swedê derket.

Heman weşanxaneyê di demên borî de pirtûka Mehmet Uzun a 'Siya Evînê', helbestên Şêrko Bêkes, pirtûkên wêjevanên tirk ên wekî Yaşar Kemal, Sabahattîn Alî, Adalet Agaoglu, Asli Erdogan û Yusuf Atilgan jî çap kiribûn.

Di rêza yekemîn a lîsteya romanan a Lîtpromê de romana Bextiyar Elî di rêza duyemîn de û pirtûka Oguz Atay a bi navê 'Tutunamayanlar' jî di rêza duyemîn de cih digire.

**ÇÎROKA LÊGERÎNEKÊ**

Roman çîroka pêşmergeyê bi navê Muzaferî Subhdam ê ji zêdeyî 20 salan di girtîgeheke çolê de tê girtin vedibêje. Piştî tê berdan diçe gel hevrêyê xwe yê şoreşger ê bi navê Jakobî Snauber. Muzaferî dema tê girtin, kurê wî yê bi navê Saryasî hêj pitik e û piştre fikra lêgerîna kurê wî pê re çêdibe. Roman jî li ser vê lêgerînê ye. *AMED*



# *'Kolan' û berxwedana Sema û Arîn Mîrkan*

SADIYE ESER / STENBOL - DÎHABER

Hunermendê kurd Seyda Perînçek bi strana 'Amara' di qada muzîka kurdî de derket pêş, bi stranên wek 'Kanî Em Birê Hev Bûn', 'Kobanê', 'Arîn Mîrkan', 'Tu Wate Yî', 'Îhsan Fettehiyan' berdewam kir. Perînçek herî dawî bi albuma 'Çûkê Ser Dara' (KOLAN) a ji Kom Muzîkê derket, bi muzîkhezan re ye. Gotin û muzîka hemû stranên di albumê de aîdî hunermend in. Dîsa di albuma xwe de, bi stranên xwe balê dikêşe ser şervana YPJ'ê Arîn Mîrkanê û Şoreşa Rojava. Perînçek der barê hûrgiliyên albuma xwe de agahî dan.

Perînçek diyar kir ku piştî keda 7 salan wî albuma xwe temam kiriye û wiha got: "Me hewl da em dernekevin derveyî terha otantîk û kevneşopiyê. Ev album bi keda derhêner û aranjor Azîz Yîgît hat derxistin." Perînçek da zanîn ku wan hewl daye albumê bigihînin Newroza 2017'an û wiha domand: "Me xwest bi germahiya Newrozê em vê albumê bigihînin gel, lê mixabin ji ber pêvajoyê me di zivistanê de derxist û xwe gihand gel." Perînçek behsa xebatên xwe jî kir û got ku ew vê xebatê deyndarê şehîdên azadiyê ye û wiha pê de çû: "Ew li dijî hêzên emperyelist û dagirker tê koşiyan û jiyana xwe ji dest da. Em ê tu carî Serhed, Xelîl, Delîla û Mîzgînan ji bîr nekin. Çimkî em bi saya wan îro ziman, reng û hunera xwe bi pêş dixin."





**2 SALAN DOM KIR**

Perînçek anî ziman ku ji merhelaya studyoyê heta roja derketinê xebatên albumê 2 salan dewam kiriye û wiha axivî: "Sedema afirandina me ya vê berhemê êş, azar, mirin, travmayên ku gel dikeve navê û li dijî her cure pêkutiyan berdêla dane bi xwe ye. Ya ku derket holê jî encama van nirxên exlaqî û manewî ye. Ez bi hemû hilberînên xwe deyndarê wan egîdên pîroz im."

Perînçek di strana 'KOLAN' a di heman demê de navê albumê bi xwe ye de, şervana YPJ'ê Arîn Mîrkan û Sema Yuce ya di Newroza 1998'an de li girtîgehê agir berda bedena xwe bi bîr tîne û ji bo vê stranê wiha dibêje: "Dikarim wek çîroka gelê bi têkoşîna azadiyê ya jinan azad bû biwesfînim." Li ser pirsa 'Çima Sema Yuce û Arîn Mîrkan' jî Perînçek vê bersivê dide: "Hevrê Arîn Mîrkan û Sema Yuce, di têkoşîna gel a li dijî tunekirinê de tê dikoşin, ew leheng in ku esaret û koletiyê bi bedana xwe mehkûm kirin. Bi romanekê, stranekê, şanoyekê tenê mirov nikare behsa wan bike. Jîndarkirina wan ji me re wek berpirsyariyekê ye."

Perînçek têkildarî strana 'Rojava' jî ev tişt anî ziman: "Li Rojava DAIŞ'ê sûcê mirovahiyê kir. Li dijî wê zilma DAIŞ'ê, dîrok berxwedana ciwan û egîdan bê nivîsandin, ev jî kêliyekî wijdana min rihet dike."



## 'Bixwîne bo zindî bîn'



Di demên dawîn de li başûrê Kurdistanê ji bo ku di aliyê xwendina pirtûkan de serwextiyek derkeve holê, hin xebat tên kirin. Ji van xebatan yek jî lidarxistina fûarên pirtûkan e. Li saziya Macîdî Mol a li Silêmaniyê bi şîara 'Bixwîne bo zindî bîn' pêşangeheke pirtûkan ji aliyê Rêxistina Girîngîdana Çalakiyan li Kurdistanê ve hat vekirin. Pêşangeh piştî du rojan vekirî ma bi dawî bû.

Berpirsê pêşangehê Avan Abdulkerîm diyar kir ku ev yekem pêşangeh e ku salane pirtûka ji xwendevanan re dibexşîne û wiha axivî: "Ji bo ku xwendevan bi rihetî xwe bigihînin pîrtûkan û ew pirtûkên ku zêde nayên zanîn di pêşangehê de bên pêşandan. Ev pirtûkên heyî ji aliyê welatî û hunermendan ve hatine pêşandan û kesên derfetên wan ên standinê tune bin bi vê rêyê xwe digihînin pirtûkan."

Abdulkerîm aşkera kir ku wan din nav 2 rojan de zêdetirî 11 hezar pirtûk kom kirine û wiha pê de çû: "Ev pirtûk niha hatine pêşandan. Ji hêla gel ve jî gelekî hatin ecibandin." **SILÊMANÎ**

www.arsivakurd.org

# Xuya Xirabe

MEHMET SEYÎTALÎOGLU

Rojê, raywanê deweke de bananê serwelinan de vejîno. Vewre qam û silamî birne. Vewre eyşto zanî. La tayê cayan doxîna însanî ra vîyarto, zafîya vewre.

Dewe mîyan de raywan raştê ju dewijî yeno. Raywan dewijî ra perseno:

- Ez şikîno tîya çêkeke de mêman bî?

-Ya.

Raywan:

-Kamjî çê?

Dewij:

- Ê banê ke di qatin ê. Oyo ke to duşt de, o yo.

Raywan dewijî ra xatir wazeno û kuno dûrî. Verba çêyê di qatinî şono. Dewij bado veng keno ra raywanî, ci ra vano:

- Xuyêde ne mordemekî ma, ê nê axaya ma esta. Xo ro haydar be!

Raywan:

- Çi xu ya?

Dewij:

- Ez zobîna çîyê nêşikîno to ra vajî.

Raywan nê vatenanê dewijî ser a xemgîn beno. Xo xo de çîyanê xirabinan fikirîno. Çimke têşuşe de mendo. Raywan şono verê çêyê di qatinî û dano çêber ro. Ju ciniîke ber akena. Mêmanî buyîrê oda kena. Axayê çêyî mêmanî ver ra vazeno ra pay. Ca musneno mêmanî.

Mêmanî rê xizmet û azet anê ca. Bêqusur qij a pîl ra pêro pîya xizmetê mêmanî kenê. La mêman qet vatena dewijî xo vîr ra nêkeno. Timûtim na “xuya xirabine” çik a, ey aqil ra nêvejîna.

Şamîya xo wenê. Sohbet û muhabet û meselanê dîyalîge ra qal kenê. Şewe xeylê derbaz bena. Teber serd o. Soba gimagima veşena. Zereyê çêyî germin o. Hêdî hêdî waxtê rakewtene yeno. Axayê çêyî kincanê xo şelêneno. Piştîya xo çarneno soba. Pirênî û tumana ver a maneno. Xo keno germin.

Axayê çêyî vano:

- Qusurê mi de nîyamede. Xuyêda min a nîyanêne esta.

Raywan newe gineno piro xo de “xuya xirabina ke dewijî vate na wa” vano. Raywan:

- Axayê min o delal. Ti honde rind a! Ti honde xeyrxwaz a! Na xuya to qet rind nîya!

Axa:

- Willayî ez mecbur a. Gere ez timûtim piştîya xo bikî adir!

Mêman xo xo de fataşîno. Çare ci rê nêmanêno. Sakoyê xo û solanê xo caverdano. Çuraçur remeno teber. Vewra zimistanî, serd û şawat de zav û zeçê çêyî kuno ra mêmanî dima. Ebe zar zor anê çê. Hal mesela mêmanî ra persenê:

- Ti qey hey bîya?

- Ez ke ameyo dewe, jû dewiji kî vat “xuyêda axayî ya xirabina esta”, na vatene ser o ez kewto teşuşe. Tersone.

Şare çêyî desta danê pêro. Bena hirqî û tirqîya zav û zeçê çêyî. Xapîyayêna mêmanî xapxapitoxî anê têlewe. Dewij û mêmanî jubînî ra benê eşkera.

Benê dost…

# Ko û deşte

**Ez se vajî. Hîkayeyade zaf nas a. Hîkayeya ke mi verê zaf cinîyan ra heşnaya. Hîkayeya ke hêrsanê mordemî kena ra. Hîkayeya ke didanan bi mordemî dana qirçnene**

ŞEYDA ASMÎN



Peroj o. Tîjade weşe ya payîzî hîna ma kena germ koyê Şengalî de. Pêro mamosteyê Serdêştê dibistana Ş. Bapîr de kom bîyê. Ê danamusê bidê raya pêroyî. Ê bi danamuse dagirkerîya dewleta tirk şermezar bikerê. Şand û şewê Koyê Şengalî serd bê kî bi roje Şengal hîna germ o. Tîja xo ya comerde hîna ma kena germ. Mi va ya tîjade zaf weş a.

Peyê danamusî mamoste Naîf nêzdîyê mi bî û bi vengode nazik va:

-Ma şîme lewê ma peroj biwerîme.

Seba ke kêyeyode bîn nas bikerî fersendode weş o. Mi no fersend qet nêremna. Ma verê xo da holika mamoste Naîf î. Xora holike nêzdîyê mektebî ya. Ma çend deqeyan de reştîme verê holike. Kêyeyode qelebalix o. Yê ke asayenê, yê ke amayî verê mi selam da mi zîyaderî kênekê. Hîrê kênekî hama ti vana qey serrê înan eynî yê. Û domanê hurîk î.

Bi ca musnayîşê yewa înan ra ez ser sekuyo ke kîşta hardo ke nêzdîyê panc metroyan bi fayansanê şalênan viraziyayo de nîşta ro. Şênîyê keyeyî bi keyf ê. Tewr ziyade kî domanî şên ê, bi xo ra dora xo kî kenê şên. Domanê hende rindekê ke! Heval tewr qickek o. Hîna çiçik limeno. Cayê xo de nêvindeno. Yewo sîsîk û çim kesk o. Canê, Lîna, Azad (Azad dibêje nameyê min o harekî Azad o) û Hamîd Hevalî ra kêm nêmanenê. Heta ke werdê peroji ame ez bi înan bîya şad.





Ya ke tewr zîyade bala mi ancena maya Naîfî ya. Seba ke ez ci ra vana dayê nameyê înan ci pers nêkena, nameyê înan çi bo kî ê dayîk ê. Rind o peyê werdî dayê çaya xo gurete ameye lewê ma de nişte ro. Sey her tawî persa min a yewîne:

-Dayê to çend domanî ardê?

Dayê bi huyayîşî, huyayîşê xo kî hende rindek o ke, cewabê mi da:

-Yewendes.

-Ooooo bi rastî dayê? Ma ti hîna zaf genc asena.

Reyna rindek rindek huyena. Ez wazena her bihuyo. Huyayîşê xo zereyê mordemî aresneno ra. Ez persanê xo domnena:

-Ma dayê ti çend serrîya xo de zewecîyaya?

Ez cewabî ra qet mat nêmanena.

-Nêzanena. Ez çi zanena mi hîna mîyanê zibil kaykerdênê pîyê mi ez gureta, daya.

Ez se vajî. Hîkayeyade zaf nas a. Hîkayeya ke mi verê zaf cinîyan ra heşnaya. Hîkayeya ke hêrsanê mordemî kena ra. Hîkayeya ke didanan bi mordemî dana qirçnene.

Mabênê ma de tayê bêvengîyê virazîye. Ma bêveng qulme daye çayanê xo ra. Seba ke ez kasveto ke virazîya vila bikerî, mi reyna pers kerd:

-Dayê eke dewa şima bêro xelesnayene, şima şorê dewa xo ya îta de vindêrê?

Rengê rûyê dayê vurîya. O ruyo geş şî ruyode bîn ame. Rûyode dej in. Rûyode bi jan. Mi dî. Roja terteleyî rûyê aye de sey filmêk bîye. Ez persa xo ra poşman bîya la reyêk fekê mi ra vecîyabî. Îmkan çînêbî ke ez reyna pey de biçerexnî. Verê xo çarna mi, ma bi çimanê hîtan amaymi têçim, ê çimê keskî çiqas rindek bî û aye va:

-Ma reyna şome deşte? Ma şîme deşte ke DAIŞ reyna bêro ma? Ma xo bidêrîme hetê koyî yo bîn.

Çekûya koyî hewayê ma vurna. Hewa reyna bî hewayê domanan.

# Vanî nameyî Dîlok, yew bajar

HESEN POLAT

*“Tîya ma de yew çî esto*
*sey dej*
*sey hêvî*
*wina rojan de her çî*
*hem sey dej o hem sey*
*hêvî”*

***(Arkadaş Z. Ozger)***

Uca ke ti bîyêne, yew dewê koyan bi. Ti uca de musayî dare û kerra, awe û erd, uca de mîlçikan û pepûkan. Ti uca de kewtî çeman zitbulit. Çi zano Heraklîtos, dîyalektik çi zano, eynî çem de çend rey! Ti êre ra hes kerd, vewre ra hîna zaf. Ti hema serrê hewtin de, ti hema wisarê emrî de, yew ziwanê şikiteyî, dingê verênî de, dewê estoran û qaçaxçîyan de.

“Versîyan ameyî, versîyan ameyî!”

Ew bajarê ke şima pê tren vîyartî, yew nameyî nî çin o, eke esto zî ti nêzanî. Pî to bêveng o, nameyî no bêvengî çin o. Destanê wayike to de yew hineyê sûre, nameyî no sûrî çin o. Zerencê şima pey de mendê, dayîkê to yê rê qehirîyena, semedê aye ra destê to nêtepîşena. Rojan ra pey, lêlê şodirî de şima ameyî yew bajarê gird. Uca de çimanê pî to de yew bîr. Hinê wayikê to şî. Serê dayîkê to de yew luwayê sîya, pencerean de pawit, zereyê yew gozî de, îlmê dejî de, rojê de panc wext no dej xebitê.

Vanî nameyî Dîlok, yew bajar. Vanî nameyî Duztepe, yew mehla.

Ti benî pîl. Merdim beno pîl helbet. Erdê xo ra dûrî de yew gozêre bena pîl. Behr de qaqlîbaz, banan de dej, Beyrûd de Feyruz, welatan de bêwelatî beno pîl.

Wexto ke to ameyî serrê hîrêsin, ke hîrês de şima benî pîl, to yew fabrîqe de dest pêkerd xebate.


Serrê hîrêsin de to nanê verênî xo girewtî.

Serrê çaresin de ti vejîyayî serbanan, cixara xo ya verêne to şimitî. Apê to koyan de kot to vîr. To koyan xo vîr ra kerdî, to pî xo ra vatî “De vaj!”

Serrê pancêsin de yew zimbêlî tenikek, porê to de leymun, hewşê ciranan de yew kêna, yew kênayê rindek. Destê to de sabun, aqilê to de çîko eyben, ti şarmîyayî.

Serrê şîyesin de rojê roşanî de ti yew kundereyî sîya, yew paçê sipî girewtî xo ra. Şodirê Dîlokî zî benî mij u dûman, serdê no bajar sey kardî. Hewa kot zereyê to ew roj, harmê to de birînê cîletan.

Serrê hewtêsin de…



Şerh bidîn, zeyl bikîn. Vaje voran de mendo, vaje apê yi merdo, Evdalê Zeynikê wa înî zî vendo.

Vanî nameyî Dîlok, yew bajar. Vanî nameyî tebaxe, yew aşme. Cê cêzî mêrde kirişenî, yew veyve. Hinî ver apê xo de, yew laj. Îlmê dejî de, yew dayîk.

Vanî nameyî merg o, yew bajar. Nika uca de her kes qersîyeno.

Rojeva Medya
2 Çele 2017 Dişeme

# Çareserî destê Ocalanî de ya

**Parlamenterê HDPyî yê Anqara Sirri Sureyya Onderî derheqê prosesî de va 'ma proseskêo giran ra derbaz benî' û qiseykerdişê xo wina domna: "Reçeteya çareserîye destê Birêz Ocalanî de ya"**



Parlamenterê HDPyî yê Anqara û Verfekê Heyetê Îmrali Sirri Sureyya Onderî derheqê proseso ke Tirkîya ti ra vîyarena de vînayîşê xo ard ziwan.

Onderî qiseykerdişê xo de vatişanê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî ke wextê pêvînayîşan de vatbî 'eke no firsend zî biagêro nêçareserî, do hêrîşî gird bibî. Eke problemê kurd çareser nêbo do derbe bikewo dewre û bi hezaran merdimî zî bimirî' ard vîr û wina va: "Heme vatişê Birêz Ocalanî raşt vejîyayî û averşîyayîşê herême zî goreyê vatişê ci qewimîyayî. Reçeteya çareserî zî ewja de bî; çimkî Birêz Ocalanî seba çareserî sîyaseto demokratîk, îradeya aştî û têkoşîno ke bi demokrasîyêka radîkal pê ameyo pêşnîyaz kerdbî. Ewro çîyo ke lazim o ma bikerî, ganî ma warê sîyaseto demokratîk hîra bikerî û sere de azadîya embazê ma yê ke ameybî tewqîfkerdiş, azad bikerî û sey rojeva xo ya esasî bigirî dest."

### BEDELÊ CI GIRAN BÎ

Onderî dewamê qiseykerdişê xo de va 'peyman, têkîlî û polîtîkayê şerî ke Tirkîya tercîh kerdo, vernîya cuyayîşî de astengîyêka gird awan kerdo' û wina dewam kerd: "Bedelê nînan xeylê giran bî. Ma hêvî kenî ke nika Tirkîya polîtîkayê ke kurdan rê dişmen î û vera statuya kurdan de asteng benî ra fek verabido. Eke wina nêkerî do prosesê kaos û nêçareserî derge bibo. Cok ra ma do her tim nêyî bîyarî ziwan û goreyê nêyî hereket bikerî. Nika yê ke welat îdare kenî, vera kurdan de nefretêko gird awan kerdî û vera nêyî de wezîfeyê ma no yo ke ma sîyaseto demokratîk û aştî awan bikerî."

### ÎXTÎMALÊ NÊVÎYARTIŞÎ

Onderî bale ant bedilîyayîşê qanûno bingeyî û wina va: "No bedilîyayîşê qanûno bingeyî ke do bêro meclîs, awankerdişê hegemonya ra zêde ti manaya ci çin o. Mîyanê nê bedilîyayîşî de seba demoratîkbîyayîşî çîyêk çin o û cok ra îxtîmal esto ke referandumê Heyetê Pêroyî de 330 reyan nêgiro. Goreyê mi îxtîmalo ke nêreso 330î, îxtîmalê resayîşî ra zêde yo. Çimkî ma vînenî ke AKP û MHP îknakerdişê merdiman de zehmetîyan ancenî."

Onderî peynîya qiseykerdişê xo de qala rewşa Ocalanî zî kerd û wina qedêna: "Bêxera munaqeşeyê ma yê ke ma raya pêroyî de kenî, sewbîna ti kanalê pêvînayîşî çin î. Destê ma de tena vatişê Ocalanî yê peyên ke vatbî 'ez eşkena şertê xo yê ewleyîye awan bikera' esto û sewbîna zanayîşêk destê ma de çin o. Bêhuzurîya ke nika welat de esta, sîstemê tecrîdî ra girêdaye yo. Eke wextê xo de vera sîstemê tecrîdî yê Îmrali de çîyêk biameyêne kerdiş, ewro do hende tepiştiş û tewqîfkerdişî nêbîyêne. Ma do proseskêo hîna giran ra derbaz bibî û beno ke sey welat ma zaf bibetilî, la goreyê mi do peynî baş bibo."

***ANQARA - DÎHABER***

# Ganî ma piştîdayîşî gird bikerî

SEDAT SUR / MÊRDÎN - ANF



Nisêbîn de hêzê dewlete bi aşman hêrîşê taxanê Zeynelabîdîn, Kişla, Abdulkadîrpaşa, Firat, Dîcle û Yenîşehîrî kerd û bi tanq û topan zafaneyê awanîyanê nê taxan xira kerd. Nika zî nê taxan de awanîyê ke bi hawayo saxlem mendî, hetê dewlete ra yenî rijnayîş, mal û milkê şarî zî yeno talankerdiş.

Babete ser o Verfeka Însîyatîfê Dayîkê Aştîye ya Nisêbînî Perîhan Altoge qisey kerde.

Altoge va 'wehşeto ke dewleta tirk Nisêbîn de kerd, zerrîya merdimî dejneno' û qiseykerdişê xo wina domnaye: "Giranîya nê wehşetî ver êdî merdim nêşkeno sebir bikero; dewleta tirk ke hêrîşê cenazeyan kerdêne û destûr nêdayêne tazîyeyan, nika zî keyeyan rijnena û talan kena. Şarê Nisêbînî êdî nêşkeno nê wehşetî qebul bikero û ma do qebul nêkerî zî. Dewlete do hesabê nê wehşetî bido û şarê Nisêbînî do kesê ke nê wehşetî kerdî, înan efû nêkero."

### ŞAR WAZENO BIAGÊRO

Altoge dewamê qiseykerdişê xo de dîyar kerde ke şarê Nisêbînî wazeno biagêro keyeyanê xo û keyeyanê dewlete nêwazeno û wina va: "Nisêbînijî awanîyê ke hetê TOKÎ ra do bêrî viraştiş, nêwazenî. Şarê Nisêbînî qet keye çinêbo zî, do erdê xo ser de mîyanê çadiran de bicuyî. Wa veradî ma erdê xo ser de bicûyî û wa wehşetê dewlete biqedîyo."

### WA BIVINDERÎ

Altoge peynîya qiseykerdişê xo de seba vindarnayîşê rijnayîşî veng da raya pêroyî û qiseykerdişê xo wina qedênaye: "No wehşet o, suc o û gune yo. Ganî şarê kurd vera nê wehşetî de têkoşîn bido û seba vindarnayîşê nê zulmî ganî her kes biwerzîyo lingan ser. Rijnayîşî ver lazimîya merdimîye hîna zêde bîyo. Cok ra ganî seba şarê Nisêbînî piştîdayîşêyewbînan bêro girdkerdiş."

# Firsendêko tarîxî vera ma de yo

FERÎT DERE / ANQARA - DÎHABER

Rojnameger û xebatkarê Newroz TVyî Herman Mavaneyî derheqê prosesê şer û polîtîkayê dewlete yê ser herême de vînayîşê xo ard ziwan.

Rojnameger Mavaneyî va 'tarîx ra nata şarê kurd her tim azadî û aştîya şaran waşto' û qiseykerdişê xo wina domna: "Rewşa ke ewro ma tede yî, netîceyê nezanî û safîtîya ma ya. Vera waştişanê ma de dewletê tirk, ereb û farisan qet bi biratîya kurdan bawer nêkerdî û nê dewletî vera şarê kurdî de tim mîyanê kayan de bîyî. Ganî ma vatiş û sîyasetê klasîkî ra fek verabidî."

### FIRSENDÊ TARÎXÎ

Mavaneyî bale ant rewşa Îraq, Sûrîye û Tirkîya û wina va: "Rewşa hemînan çiman ver de ya. Kerra ser kerra de nêmendo. Firsendêko tarîxî ameyo berê ma ver, eke ma xo bidî ser, ma do bibî wayîrê qezencêk. Eke kurdê Başûrî erdê Başûr de vera estena leşkeranê tirkî de, kurdê Rojawanî vera hêrîşanê tirkan de helwestêko hîna wişkêr nîşan bidî, o wext hem Rûsya û hem zî Amerîka do nêverdî ke dewleta tirk mabênê Kobanê û Efrînî dagîr bikero. Cok ra eke kurdî nê firsendê tarîxî qurbanê menfîetanê xo yê şexsî û partî nêkî, do serkewtişêko tarîxî qezenc bikerî."



# Yurt û unîversîteyan de zextî zêde bîyî

MELEK YUKSEL / AMED - ANF




Teşebusê derbe ra dima rewşa îstîsnayî (OHAL) amebî îlankerdiş û her hetan ser de hêrîşê topyekunî hetê îqtîdarî ra ameyî kerdiş. Bi hezaran merdimî tewqîf bîyî û reyna bi hezaran merdimî zî karî ra ameyî dûrîvistiş. OHAL ra dima unîversîteyan de zî zext û tedayî zêde bîyî.



Tevgerê ke vera zext û tedayan de xover danî ra yew zî tevgerê Kampus Cadilari yo. Ciniyê ke 17 unîversîteyan de bi sloganê 'Femînîzm seba her kesî yo' ameybî têhet û seba ke vera tacîz, tecawiz, şîdet û neheqîyan de piştîdayîşêyewbînan yê cinîyan awan bikerî, perwerde û saetê wendişî virazenî û bi no hawa hewl danî ke zanayîşêk awan bikerî.

### HER CA DE POLÎSÎ ESTÎ

Aktîvîsta Kampus Cadilari Ozge Şahîne va 'OHAL ra dima unîversîteyan de zext û neheqîyî zêde bîyî' û wina domnaye: "Polîsê zirxinî ke weçînayîşê 7ê Hezîrane de unîversîteyan de ameybî bicakerdiş, nika herinda înan de polîsê sîvîlî ameyî bicakerdiş. Hetta nê polîsî bi şeklê wendekarî de kewtî heta kantîn û zereyê unîversîteyan. Ma bi no hawa zaf polîsan deşîfre kerd, polîsê ke deşîfre bîyî şîyî herinda înan de polîsê bînî ameyî. Nê polîsan ra tayê goşdarî kenî, tayê zî bi ewnîyayîşê xo, cinîyan tacîz kenî."

### MA PÎYA TÊKOŞÎN BIDÎ

Şahîne dewamê qiseykerdişê xo de va 'nika yurdan de polîtîkayê taybetî yenî meşnayîş' û wina va: "Seba ke rêxistinîya cinîyan ra zaf tersenî, wexto ke mîyanê yurdî de 4-5 cinîyî bêrî têhet, ca de îdarekaranê yurdî ra kesêk yeno û nê kesan muhakeme keno. Wazenî bi no hawa rêxistinîya cinîyan biqedênî, çimkî beşa camêrdan de çîyê winasî nêbenî. Femînîzm seba heme kesan lazimîyêk o. Ganî ma vera nêheqî û zextan de têkoşîn bidî."

www.arsivakurdi.org

ROJEVA
# Medya
2 Çile Duşem 2017

**ROJEVA MEDYA**
**Ararat Basın - Yayın**
**Reklamcılık Adına**

İmtiyaz Sahibi:
**Murat SEKMEN**

Yazı İşleri Müdürü:
**Mehmet Çetin ALTUN**
***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
***Yenişehir-DİYARBAKIR***

***Tel:*** 0 (412) 224 35 93
Baskı ***(ÇAP):***
***İstanbul:*** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.

Akasya Sok. ***No:*** 23/A
***Küçükçekmece İSTANBUL***
***Tel:*** 0 (212) 580 63 81
***Adana:*** Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık

Yeni Doğan Mah. 2108 Sok.
***No:***13/A ***Yüreğir / ADANA***
***Tel:***0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
***e mail:***
rojevamedya@hotmail.com












# Zixura Muradê zivistanan xweşiktir e



Li Giyadîna Agiriyê, Zixura Muradê (Kanyona Muradê) di zivistanê de, bi Çemê Mûradê yê di nav re derbas dibe û bi şembelîlkên çîlspî, bedewiyeke nûwazetir li xwe dihebîne. Zixura li rojavayê navçeyê dikeve û bi qasî 20 kîlometreyan dûrî navçeyê ye, li hin cihan bilindahiya wê ji 50 metreyan jî derbas dibe.



Muhmet Kaplan ê 50 sal berê li li zixurê mal çêkiriye û bi xwedîkirina sewalan mijûl dibe, anî ziman ku zixur her demsalê xwedî bedewiyeke cuda ye û wiha axivî: "Ev 50 sal e, em li vir dijîn. Malên li vir aîdî min û birayên min in. Li vir jiyaneke me ya aram heye. Li gel mehên zivistanê dijwar bin jî ev der germ e. Berê çemê Mûradê qeşa digirt, lê piştî tevlibûna avgermê êdî qeşa nagire. Havînan her der şîn dibe û zivistanê jî qeşa digire. Ev der ji bajaran xweşiktir e û ev dîmen jî li tu deverê tune ne." **AGIRÎ - DÎHABER**


## Çîn dê hilberîna komirê kêm bike



**Li Çînê ku di sala 2015'an de zêdetirî 3,7 milyar ton komir hat derxistin, di sala 2020'an de dê 800 milyon ton bê kêmkirin.**

**Li gorî ajansa Xinhua, bi xebitandina komirê ji sedî 62'yê elektrîk tê bidestxistin, sala 2020'an dê mezextina komirê bi giştî 4,1 milyar ton be. Di nûçeyê de tê gotin ku di sala 2015'an de 3 milyar û 960 ton komir hatiye xerckirin û hat diyarkirin ku dê ji îsal û şûnde hilberîna komirê bê kêmkirin.**

**Di nûçeyê de hat ragihandin ku sala 2016'an 250 milyon ton kêmtir komir hatiye derxistin û hat destnîşankirin ku dê heta 2020'an li Çînê hilberîna komirê 800 milyon ton kêmtir bibe. PEKÎN - ANF**




# Kevirên kurmancî raza temendirêjiya malên Mêrdînê ye

AYNÛR ÎNEDÎ / MÊRDÎN - DÎHABER

Kevirên Mêrdînê yên ji şikeftan tên derxistin û ji zinaran tên peydakirin, temenê wan xwe digihîne 2 hezar salan. Dîwarên van malên ku ji kevirên şekirî tên çêkirin, bi qasî metre û nîvekê ne. Kevirê Mêrdînê li gorî ebatên taybet tên jêkirin û di berhemên hunerî û karên xişir û neşiran de tên bikaranîn. Ev kevir, li ocaxan bi makîneyan bi awayekî rast û dirêjane tên jêkirin û bi heman makîneyê jî, bi tîkane tên jêkirin.

Hosteyê keviran Mehmet Nafî Ersan anî ziman ku malên bi 'kevirên kurmancî' hatine çêkirin havînan hênik û zivistanan jî germ in. Ersan diyar kir ku hezar sal jî di ser van keviran re




derbas bibin jî tiştek bi van nayê û destnîşan kir ku kevirên mala ew lê rûdinê aîdî 2 hezar sal berê ne û wiha got: "7 sal berê kevirên vê malê ji ber siwaxa reş nedixuyan. Lê dema min siwaxa ser rakir, xweşikbûna wan derket."

Ersan got ku niha nirxê van keviran ketiye û wiha domand: "Li Mêrdîna kevn mitbex, serşok, lawabo li hewşê ne. Li malekê 2-3 kesan tifik çêdikirin. Jiyaneke hevpar hebû. Lê niha mirov berê xwe didin cihê rihet."

Ersan anî ziman ku siwaxa reş di 1983'yan de hatiye Mêrdînê û destnîşan kir ku ev siwaxa reş ku li ser keviran tê kirin bêhnê li keviran diçikîne. Ersan da zanîn ku ew kevirên siwaxkirî şe dike û wiha pê de çû: "Dema sewax bê rakirin û kevir bên şekirin, kevir bêhnê distînin û emrê keviran sed sal dirêj dibe. Jixwe carekê bê kirin bes e."

Ersan bi bîr xist ku li Mêrdînê gelek malên bên restorekirin hene û divê ji bo vê yekê piştgirî li wan bê kirin û wiha pê de çû: "Gelek mal, ji ber bêxwedîtiyê roj bi roj hildiweşin. Lê em dixwazin temenê avahî û malên dîrokî dirêj bikin. Ger wiha be dê deng û rengê Mêrdînê hîn zêdetir xwe bide der."

Li Mêrdînê hosteyê keviran Mehmet Nafî Ersan ê ji bo malên bi kevirên kevnar hatine çêkirin temenê wan dirêj be karê şekirinê dike anî ziman ku heke şekirin neyê kirin dê ev malên dîrokî xira bibin



## Cezayê hişmendiya zilaman ZAROK DIKIŞÎNIN



Kapîtalîzma global roj bi roj cîhanê dike bin mêtingeriya xwe û ev jî şer, xizanî û birçîbûnê bi xwe re tîne. Zarokên ku li dijî birçîbûnê tê dikoşin jî di esasê xwe de nîşanî mirovan dide ku pêşerojeke çawa li benda mirovahiyê ye. Li gel li Tirkiye û Kurdistanê sermayeyeke tund heye jî zarok li kolanan pêlavan boyax dikin, mendîlan difiroşin an jî parsekiyê dikin.

Muhammed, Huseyîn û Berfîn ên ji ber şerê li Sûriyeyê koçî Wanê kirine, ji van zarokan in. Van her sê zarokan di temenekî biçûk de berpirsyariyeke mezin girtiye ser milê xwe û dixebitin. Zarokê bi navê Huseyîn Can ê 11 salî ji bo ku alîkariyê bide malbata xwe camên wesayîtan paqij dike û anî ziman ku ew sibê pêşî diçe dibistanê û piştî dibistanê jî diçe camên wesayîtan paqij dike û wiha got: "Li gel sermayê ez vî karî dikim. Ez pereyê ku qezenc dikim didim dayika xwe."

Zarokê bi navê Muhammed Ahmed ê 10 salî jî ji bo ku alîkariyê bide malbata xwe mendîlan difiroşe û da zanîn ku ew carinan rastî pêkanînên xirab tê û wiha got: "Ji me re dibêjin hûn parsek in. Lê ez ji bo malbata xwe karê firotina mendîlan dikim. Ez jî dixwazim bixwînim lê dibistanên Tirkiyeyê me qebûl nakin." Zaroka bi navê Berfîn Çelîk a 11 salî jî mendîlan difroşe û wiha dibêje: "Ji ber ku ez vî karî dikim hevalên min bi min re naaxivin. Carinan camên wesayîtan jî paqij dikim. Kesên nebaş jî hene. Heqaretan li me dikin lê belê em xwedî li hev derdikevin." **WAN - ŞÛJIN**

www.arsivakurd.org